

BERBANG

ORGANA FEDERASYONA KOMELÊN KURDISTANÊ LI SWÊDÊ



BERBANG

Organa Federasyona Komîlen Kurdistanê Li Swedê

Berpirsyar:

Hanefi Celeplî

Redaktore sereke:

Mueyed Teyib

Redaksiyon:

Ahmet Cantekin, Baye Nazê,

Xebat Aref, Zinarê Xamo.

Pergela Rûpelan fi rîzkirin:

Ahmet Cantekin, Broye Macîr

BERBANG

Organ för Kurdiska Riksförbundet

Ansvarig utgivare:

Hanefi Celeplî

Chefredaktör:

Mueyed Teyib

Redaktion:

Ahmet Cantekin, Baye Nazê

Xebat Aref, Zinarê Xamo.

Layout och sättning:

Ahmet Cantekin, Broye Macîr

Navnisan / Adress:BOX 45205
104 30 Stockholm**Navnisan seredane / Besöksadress:**

Hornsgatan 80, lfr. Stockholm

Telefon:

08/68 60 60

Postgiro:

Kurdiska Riksförbundet

64 38 80 - 8

Abonevi / prenumerationer:

Kes / Enskilda 100 Skr./sal-ar

Maqam / Myndigheter 200 Skr./sal-ar

İlan / Annons:

Berge paşin / Baksida 2000 Skr.

Rûpelên navin / İnsidör 1000 Skr.

Nîvrûpel / Halva sidan 500 Skr.

ISSN - 0281 - 5699

NAVEROK

Sefaret an axurê tawankaran 3

M. Kardo

"GAP" û rastî 4

A. Rona

Hukumeta Swêd dixwaze hindekariya
bi zimanê zikmakî ji holê rake 5

Hesen Mizgin

Yekîtiya zimanê kurdî dibê
armaanca me be 8

Zinarê Xamo

Li Kurdistanâ Başûr 9

J. Rexnegir

Nijadperestan Ronny Lundîn
kuştin 10

Ji komelên endam 11

Burjuvaziya tirk carek din
xwe kir pêkenînê cîhanê 14

Reşoyê Qerejdaxî

Şairek û helbestek 15

Lawik û steyrik 16

Sergey Korîpanov

Weşanên nû 17

Mekîney dirûman 23

Roza

Du çirok ji Tolstoy 20

Kiçe şîrfiroşeke 19

Bergê Pêşin:

Civîna dijî nijadperestiyê li Stokholmê

Bergê Paşin:

Jineke Kurd

Wênekêş: T. N. Yablonskaya

Sal: 5 Hejmar: 4/86 (36) 4.8.1986

SEFARET YAN AXURÊ TAWANKARAN?

M. Kardo

Min deng û bahsên radyo û rojnameyên berî sed salan ne bihistine, lê ez dizanim guherînek mezin bi ser de hatiye.

Dibêjin berî sed salan, roj ne bû xeberê ketina hêzeka şoreşgêr, dagirkirina welitek din ne yê bîstin. Lê iro roj nîne mizgîniya serhildana gelekî, serketineka şoreşkê, ketina rejême-ka faşist, paşverû û dîktator ne yê bîstin.

Ne ji mîje bû tac û textên Somoza, Bokasa, Îdî Emîn, Şahê İranê, Markoz...hwd, li ber derbêن şoreşgera ketin û hîn gelekên din yên weke wan li rîzê rawestane, li benda sizayê (ceza) gelan û tenê her ew dizanin sizayê gelan çiqas dijware, laneta dîrokê jî pêre.

Weheye (mumkine) rijêma faşista Seddamî li pêsiya vê listê be. Ev rijêma ji hamû sinûrên stemkarî û hovitiyê derbas bûyi.

Şoreşgerên başûrê Efrîka di hemû belavok û beyanên xwe de, bi pendekâ pêsiyan destpê dikan, ev pend dibêje "hesp berî mirina xwe cutkên dijwar dihavêje" -anko dema hespek cutkên dijwar dihavêje, ew mirina wî nizîk bûye.

Rijêma Seddamî jî di vê rewşê de ye. Ev rijême her jî roja reşa 17 tîrmeha 1968-an, ku hukimê İraqê xisitiye destê xwe û heya iro xwîna gelên di sinûrên İraqê de dijîn, dirijîne û hîn têhna dilê Seddamî ne şkestiye. Bi gotina Seddamî bi xwe "li sala 1974-an di şerê şoreşa gelê Kurdistanê de 60 hezar esker hatine kuştin". Di şerê ıanê û İraqê yê ku Seddamî berî 7 salan destpêkirî û hîn domdi-ke ne kêmtrî jî nîv milyon kesan ji her du welata hatine kuştin yan bê dest û pê mane, bi sedan gund û bajar kavil bûne. Ne tenê ev, li gor infor-masyona hêzên şoreşa Kurdistanê û

hêzên demokratên İraqê pêtir ji 30 hezar kesan bi sêdarê ve bûne yan bi eşkencê şehîd bûne û tenê rijêma Saddamî dizane kanê çend hezarên din bi metodên wan yên faşist wenda bûne -ji wan gelek hevalên nizîkên Seddamî bi xwe.

Bi kurtî, di dîroka İraqê de, tu rijêm bi hovîtiya Baas ne bûne. İraq bûye gola xwînê û hîn bêhna Seddamî xwînrêj nehatiye, êdî destê xwe yên gemarî dirêjî dervey sinûrên İraqê dike û sefareten xwe kirina axurê tawankaran. Ev tawankaren (qatil) xwîna hezaran lawên Kurd û Ereb bi destê wan ve ye, karê Seddamî yê hundîrî İraqê temam dikan.

Sal na bore rojnameyên Ewrupayî behsa tawanên sefareten Seddamî nekin û eger mirov listeyekê jî karên hovîtiyên sefareten Seddamî binivîse, eve hemû rûpelên Berbangê têra nakin. Lê ez dixwazim çend nimûneyeka ji tawanên sefareta Seddamî li Swêdê di van çend salên borî de behs bikim.

—Di sala 1983-an, meşek li dij sefareta Seddamî derket. "Diplomatê!" sefarete şesderba xwe li meşê derxist, lê berî ew bigehe şesderba xwe bi kar bîne, kesen besdarên meşê ew xistin bin piyan û polisê Swêdî ew ji nav pêlavân -ciyê wî yê layiq- derxistin. Roja paştar wêneyê wî li erdê, di rûpelên pêsiyê yê rojnameñ Swêdî de, derket û dema rojname jê pirsîn te çewa debance li xelkê derxist, bersiva wan da û got "min vê carê debance derxist, lê ger carek din pêwîst be, ezê gulla jî berdim".

—Li sala 1984-an, li daristanekê li başûrê Stockholmê termê (laş) efse-rekê (komîser) kevnê muxaberetên İraqê -ku reviya bû û hatibû Swêdê-hate dîtin. Ev term kiribûn 54 perçê, anko sadizma dezgehêن Seddamî

gihaye wê pileyê (derece) ku bêhna wan bi kuştin jî nayê, êdî terman jî perçê-perçê dikan.

—Li sala 1985-an, Azad Hisêن Cindî, penahendeyekê (multecî) welatparêzê Kurdistanâ basûr, bi destê muxaberatê Seddamî, di oda xwe de hate kuştin. Li gor raporê doktoran, şehîd Azad hatibû xeniqandin paşî çarde kêr li pişata wî xistibûn.

—Li 30-î Gulanê termên bûk û zavayekê kurd li daristaneka bajarê Eskilstuna hatin dîtin. Birehîm û Befrîn ew şes meh bûn bi ser daweta wan re borîn. Li bajarê Eskilstuna -ku nizîkî Stockholmê ye-hevdû nas-kiri bûn û zimanê swêdî dixwendin. Destê muxaberatê İraqê gihane wan û kuştin. Li gor rapora polisê Eskilstuna, Birehîm û Befrîn ketibûne bin eşkencyeka pir dijwar û şûnwa-rên derb û şewitandinê li laşen wan eşkera bû û her deh neynükên Befrînê hatibûn kişandin û termên wan haveti bûn nav daristanê.

Weke min li jor gotî, ev tenê çend numûneyekin jî tawanên sefareteka Seddamî. Ev sefareten ku bi kar û tawanên xwe hemû rewîstên (urf) diplomatîk xistine bin lingên xwe û ji temamî raya giştiya Swêd û Ewrupayê re rîswa bûne.

Bi gotina şêfê polisê Stockholmê, yekemîn diplomat, di dîroka Swêdê de, şesderba xwe li yekî derxe, "diplomatê!" İraqî bûye li sala 1983-yan û eger navê yê duwem bibêje, "diplomatê!" turk bûye li sala 1986-an û ne dijware ku mirov biza-ne yê seyem dê kî be!

Mirov nizane, çend wext û çend tawanên din pêwîstin, heyâ ji dewle-tên Ewrupayî re eşkera bibe ku ev ne "SEFARETIN!" û yên tê de kar jî dikan ne "DİPLOMATIN"?!? ●

”GAP“ Û RASTÎ

A. Rona

Demeke dûr û dirêje li Tirkîyê, di televîzyon, radyo û rojnaman da meselekê gelek aktuel (rojîn) heye, ku toz û dumanê radike, yên ku haya wan ji vê buyerê tunebin, yê bêjin yeqîn defa hewarê lêdikeve. Her roj li ser navê hikumetên kevnare û nû, serekwezîrên wan, bi dengekî bilind va çêri hev dikin û seferên mezin û merasîmên giregir va xwe dighînin herêmekî.

Gelo ev ringînî û teqînî ser ci sede-mî ewqasî deng dide, ser ci mumesilê burjuvaziya yekdest, hemberî hev ewqas rik û hêrs êrîşî hev dikin. Mirov bersîva vê pirsê dikare di hevokêkî da bide nîşandan: Kolonyalîstên Tirk dixwazin ser ax û bereketa Kurdistanê, kar, çeviandin, kedxwarin û îstîla xwe xurttir bikin. Hemû deng, def û ser li ser vê yekê tê ajotin.

Li Kurdistanâ Başûr, ser navê ”GAP“ (Proja Anadola Başûrê Rojhîlat) projek tê avakirinê. Ev proje, cawa tê gotin, di dîroka Tirkîyê da mezintirin proja dewra cumhuriyetê ye. Proje, heremên nav çemên Fırat û Dîcle, jêraliyêvan çemanda, li ser 74 hezar km² tê çekirin. Urfa (Ruha) û Merdîn giştî: Entap, Diyarbekir, Ediyaman, Sêrt û qismekî Vanê mezin dikeve nav pilana vê projê. Di 1930-î da li ser vê projê hatiye sekînandin, lê hetta sala 1976-a tu xebat nehatibû kirin. Paşê li ser navê ”Proja Herêma Fıratê“ hat naskirin: piştra ”Plana Herêma Dîclê“ ji tevî vê projê kirin û ji wê şûnda navekî nû danîn ser: GAP (Guneydogu Anadolu Projesi).

Wek hatiye plankirinê ”GAP“, divê li ser çemê Dîcle û Fıratê ji 15 bendav (baraj) û 18 santralê hidroelektirîkê wê pêk bê. Dîsa gor planê vê projê, di xelasiyê da, 18 mîlyon donim erazi wê bê avdanê û 27,8 mîlyon kw-seet enerjiya elektirîkê bê dest xistin. Ew enerjiya bi serê xwe, qasî tevayiya enerjiya elektirîka Tirkîyê ya îroyinê. Eraziyê ku wê bê avdanê ji, wê ji 3 mîlyon donim zêdetir be. Eraziyê îroyîn, ku ji aliyê dewletê tê avdanê, 15 mîlyon donime. Em

dikarin bejin, eraziyên ku wê bi proja ”GAP“ ê bêñ avdanê, ji &33,81-î, di warê hidroelektrîkê da ji 4 qata gor ya îro wê zêdetirbe. Ev hejmarana ji nîşan didin, ku proje wê ji bo dewleta Tirkîyê gelek imkanen mezin û nû bi cih bîne.

tan, tesîreke mezin li ser aboriya wan kir. Enflasyon, pirsa bazarê û bêkarî her çû mezintir bû. Îro li Emerîka û Ewropayê hejmara bêkaran digihîje 30 milyonan.

Wê krîzê, xwe hetanî dawiya salên 1970-î nîşan da. Lê di wê nabeynê da,



Lê belê, gelo ev proja mezin wê ji bo gelê Kurdistanê ci imkanan pêk bîne? Gelê Kurdistanê, wê di warê aborî, civakî, perwerdekirin û siyasi da têkeve rewşike çawa? Em dixwazin bi kurtî li ser vê yekê bisekinin.

Berê, sermiyandar û monopolên Tirkan û imperyalîstan ji vê projê ci hêvidikin? Ev yeka gerek baş bê test-pîtkirinê.

Ji 1970-î û vîrda, di ekonomî-polîтика monopolê navnetewî da gelek guhartin çêbûn. Krîza petrolê wê demê gelek problem bi xwera anîn. Bi taybetî ji li pey şerê Vietnamê, nav monopolê Emerîkî û Ewropayê da leceke (reqabet) mezin dest-pêkir. Gelek kompleksen sinaî da, giranî ket destê monopolên Ewropî. Aliyê din da ji bi teknolojîke bilind va Japonya ket bazara dînyayê. Krîza aborî tesîra xwe di warê siyasi da ji nîşan da. Kontrola Emerîkayê li gelek ciyan şikest. Hemû welatên koloni û yên di bin bandora mîlitârîzmê da bûn, di wan welatan da şerê ji bo demokrasiyê û di Rojhilata Navîn da dengê gelên bindest li dijî emperyalîzmê, bi taybetî ji li dijî Emerîkayê bilind bû.

Ev opozîsyona li dijî emperyalîs-

sermiyana Emerîkî, stratejîke nû û hişk girt û di şexsê Reagen da siyaseteke serbaz û îstîflâ da ajotine. Li ber vê siyasetê, gelek dewletên Ewropî di serî da ji Brîtanya û Elmanya Federal, serê xwe ji wanra xwar kirin. Sermiyana Emerîkî carkê din inisyatiyiv kire destê xwe.

Emerîka îro bi vasita IMF û Banka Dinê va midaxaleyî ekonomî û siyaseta gelek dewletan dike. IMF û Banka Dinê wek organên aborî, li ser aboriya dewletên kapîtalîst û dewletên şundamayı da kontroleke esasî didomînin. Yek ji dewletan ji Tirkîye ye. Plana aborî û siyaseta Tirkîyê ji sedî sed di bin kontrola IMF û Banka Dinê da tê meşandin. Biryar û pêneyarêvan organên malî, bêgotin ji aliyê hikumeta Tirkîye da têni bi cih anîn. Proja ”GAP“ ji di nav van planan da gerek bê şirovekirin.

Di destpêka sala 1980-î da, di nav planê Banka Dinê da, ji bo Tirkîyê pirsa çandinî û enerjî cîhekî taybetî digirt. Biryaren 24-ê Çileyê Paşîn (Ocak), li gor van planan hatin meşandinê.

Kurdistan û Tirkîye, di warê çandinî da, di dinê da xwedî potansiyel

leke gelek mezinin. Nifusa van wela- tan ji %55 jiyana xwe bi çandiniyê didomînin. Li hemberê vê potansiyelê, mercen bingehîn ji bo gelê karker û xizan pêk nehatine. Li ser vê potansiyela mezin, birçbûn, belengazî, teda û kedxwarineke (çevisandin) neditî xwe didomîne. Herêma ku GAP lê tê avakirinê, ev newekhevîti xwe zêdetirîn nîşan dide. Tenê çend hejmarên bicûk vê ferqê baş didin nîşandanê. Li herêma "GAP"ê, ji 5424 gundan 596 yên şexsekîne, yan jî yê malbatekîne. Kesên ku binecîh bê erdin, gor hinek bajaran wek jêre ye:

Urfa(Ruha) : %53.7

Diyarbekir : %46.8

Mêrdîn : %40.8

Li herêma "GAP"ê ji %4.5 erd di destê %49 kesan da, ji %60-i erd jî di destê %10 kesanda ye. Çawa tê xuyanê, ji sedî şestî (%60) erdê di desten aya, beg, mîr û karbidestanda ye. Ev yek bi serê xwe hovîtike mezine. Bi "GAP" va ev hovîtî û newekhevîti, wê her biçe mezintirîn be.

Li gor biryaren 24-ê Çileyê Paşîn, santralîze kirina çandiniyê hatibû plankirinê. Gor zagonê ekonomiya kapitalizmê, ew erdênu ku beşê bicûkin, divê li ser esasê beşê mezinda, ji nu va bênen organîze kirinê. Lewra, beşê bicûk dîbin sedemê bê randimaniyê. Di gel vê yekê beşê bicûk çiqas fireh bin, têkiliyên aborî jî ewqas qels dîbin û kontrola wan jî zêdetir dijwar dibe.

IMF û Banka Dinê, ji bo ku potansiyela çandiniyê bênen kontrol kirin û bênen santralîzekirinê, carekî din mida-xaleyî hikumeta Tirkîye kir û biryaren 24-ê Çileyê Paşîn bi wana dan qebûlkirinê. "GAP" li ser van biryar û planan, ji bo monopolên navnetewî û Tirkîye tê amadekirinê.

Îro, sermiyandar û monopolên Emerîkî, Fransizi, Hollandî û yên Ereb dixwazin li vê herêmê erden mezin zeft bikin. Sermiyandarê Tirkân ji wan şundatir namînin: tenê Sabanci Holding dixwaze li vê herêmê ji 2 milyon donim zêdetir erd bikini. Ev yeka tenê nîşan dide, ku "GAP" ji bo kê hatiye plankirinê. "GAP", milkiyeta piçuk wê ji holê rake, heqê jiyanê nade wan, bêkarî her wê zêde û xizanî her wê mezin bibe.

Berya ku "Seferê humayûnê" destpêbikin, erdêni di dest gundiyan

bicûk da hatibû istîmlak kirinê û ketibûn bin destê holdingan. Gundî jî bê ax û bê xanî man. Îro li ser herêma ku "GAP" tê avakirinê, 4.445 806 kes (gor hejmara 1985) dijîn. Ji bo gundiyan ku mal û erdê wan ji dest hatine girtin, tu tişt nehatiye plankirin. Ew bêçare û perîşan mane. İstîmlakê da erdê destê wan, m2 bi 10-60 lîrê Tirkâ hatiye girtin. Gundiyan reben, "Wê perê ku didin me, ne tenê têra avakirina jiyanekê nû, têra bar-kirina mala me jî nake" dibêjin. Berbiçave ku dewleta Tirkan yê metîngehkar erdê gundiyan ji wan nekiriye, navê vê kirinê zevtkirin û dagirkariye.

Baş tê xuyanê ku ev proja ji bo xatirê gundi û rûniştanê vê herêmê nehatiye çekirin, ew tenê ji bo xizmet û xurtkirina monopolên navnetewî û yên Tirkîye hatiye plankirin. Armanca vê planê santralîze kirina çandiniyê ye. Monopol tenê gor kar û qezanca xwe axa Kurdistanê organîze dikin. Bi pêkanîna vê projê, rewşa gundiyan belengaz wê hîn jî xirabtir be, xizantî û kedxwarî wê roj bi roj zêdetir be.

Bêşik, em li ser axa Kurdistanê ne li dijî industrî û çandiniyeye nujen (modern) in. Lê bi şertekî wa ku ger ev yek li gor menfaata gelê wê herêmê, bo avakirin û pêşdabirina warê aborî û civakî da bê çekirinê, erd û zevî di nav gundiyan xizan û bê milk da bê parevekirinê. Lê eşkereye, ku ji bo pêşdabirina rewşa welat û gelê me, kes ji kolonyalisten zordest gavêni wisa pêşda hêvî nake.

Serok wezîrê Tirkîye Turgut Ozal, sefera xwe ya "GAP"ê da ji rojnamevanan ra "Emê li ser vê axê medeniyeteke nu bixuliqîn" digot. Bi rastî jî ne tenê Ozal, hemû kolonyalist û împeryalisten dinê, navê zilm-zordarî û hovîtiya xwe danîne "medeniyet". Lê gelê Kurdistanê jî tevî gelê dinê, vê "medeniyet"ê baş nasdikin. Ü ev medeniyeta wan hertim bû bela serê wan.

Baş tê zanîn ku li weletekî, kedxwarî, zilm û teda çiqas zêde be, muxalefeta civakî jî ewqas tuj û xurt dibe. Ev proja wê ji bo menfaatên monopola kedxwarî, xizanî û birçtiyê qat bi qat zêde bike. Lê li hember vê yekê, tevgera karker û gundiyan vê herêmê jî wê hin xurttir bike. Ev yek, prensibek ji kapitalîze kirina tekîliyên aboriyê ye.

REZALETEKE DÎPLOMATÊN TIRK Û EMRÎKÎ

Di 12-ê maha Tirmehê de dîplomatêkî Tirk û delegasyoneke dîplomatê Emrîkî li Stockholmê diçin diskoteka Alexandrayê dixwin, vedixwin û li dora saet 02.30 de radibin, herin bê ku heqê xwarin û vexwarina xwe bidin. Lê servîrsîa diskotekê ji dergevanê diskotekê re dibêje: wan bernde der, ji ber ku yekî ji wan heqê xwe nedaye. Wexta dergevan wan disekinîne, dîplomatê tirk, demaça xwe dikşîne û ji dergevan re dibêje: "Xwe bide alî, an ezê serê te bipeli-xînim."

Diplomatêkî Emrîkî hê hartir, bi bejna xwe ya tirtire û qalind dirêjî dergevanê dike û dibêje: "Li min binêr kovboy, xwe bide alî an derba ewil ji min..."

Lê dergevan Lennart Matikanen, natirse, paşê polîs têr dîskotekê û heqê xwarina wan ji wan distîn û didin servîrsî.

De werine vê rezaletê: dîplomatêk, temsîldarê dewleteke tenezzulê 350 kronê dike, pêre ji wekî tolazên kuçan demaça dikşîne û rezaletî derdixe.

Bi ser vê bûyera rezaletî sefirê Tirk li Stockholmê Haluk Ozgul, ji alî wezareta xaricî ya Swêd banî wezaretxanê dibe, û tê ikaz kirinê.

Mumkun bû, ku heqê sîlehgerandinê ji vî dîplomatê Tirkbihata girtin, hetta ji Swêdbihata siktirkirinê. Lê ceza van rezila bi îqazkirinê ma.

Li vir rewşekê di bala mirova dikşîne, ku delegasyoneke Emrîkî û li angorî rojnama Dagens Nyheter, aqildanê wan dîplomatê Tirk çiqas di navhev de ne, ku mirov dikare bi rehetî bibêye yekperçene. Gelo vî aqildanê Emrîkiyan ci ji mezinê xwe re dibêje? Kî zane belkî bi hevra li dijî Kurdîn derva gelek dek û dolaban bi hevre digerînin. Ü kî zane, ku hê ci kes di nav vê xebata qirêj de nin. Divê haya me baş ji me hebe, ku dijmin hare û nevala ye. Gere em jî yekbin û şiyarbin. Ne tenê li nêz, li dûr jî binêrin.

HUKÛMETA SWÊD DIXWAZE HÎNDEKARIYA BI ZIMANÊ ZIKMAKÎ JI HOLÊ RAKE

Hesen Mizgin

Bi ûnisiyatîva Sendîka Mamostan Ya Swêdê (SL), hukûmeta Swêd di sala 1975-an de ji bo lêkolîna rewşa zarokên biyaniyan li dibistana destpêkî (ya neh salî) û liseyê (2-4 salî) komîtek ava kir. Komîtê, xebata xwe di dawiya sala 1975-an de qedand û pêşniyarêne xwe pêşkêşî hukûmetê kirin. Sendîka Mamostan A Swêdê (SL), di wê demê de pêşniyara xwe ya pêdivibûna dersa bi zimanê zikmakî kiribû, lê belê nehatibû qebûl kirin.

Piştî raberzîneke bi dûr û dirêj, ku li Parlamentoya Swêdê hate kirin, mafê dersstendina bi zimanê zikmakî hate qebûl kirin. Naveroka qanûna ku di dawiya sala 1975-an û di destpêka sala 1976-an de hate rêk xistin, weha bû:

— Ji bo zarokên ku zimanê wan ê zikmakî ne Swêdi e, mafê dersstan-dina bi zimanê zikmakî,

— Piştî mûracata dê û bav, mesûliyeta belediyan a bi rêk xistina dersa bi zimanê zikmakî,

— Pêdiviya belediyan a ji bo lêko-lîna hewceyîyen şagirtên biyânî û ji bo hîndekariya bi zimanê zikmakî program amadekirin,

— Li bajarêne wek Stokholm, Mal-mo û Molndalê vebûna beşa dibista-na bilind a mamostetiya zimanê zikmakî (Bi kontenjanekî ji bo 120 kesan),

— Ji bo zêdeyî 500 mamosteyê zimanê zikmakî kursên taybetî yên hîndekariye bi rêk xistin.

Weke ku li jor jî xuya ye, ji bo pêdiviya dersa bi zimanê zikmakî tu paragrafek tuneye. Sendîka Mamostan A Swêdê (SL), di sala 1976-an de bi pêşniyarekê muraceata hukûmetê kir û pêdivibûna dersa bi zimanê zikmakî daxwaz kir. Lê pir mixabin ev daxwaz nehate qebûl kirin.

Di navbera wê rojê û iro de deh sal derbas bûn. Reforma hîndekariya bi zimanê zikmakî fêkiyên xwe dan. Civata Swêdê dest bi xwarina van fêkiyan kir. Lê di navê re demek dirêj derbas nebû. Hukûmetê bi bendê nû di qanûna mafê hîndekariya bi zima-

nê zikmakî de hin guhertin çêkirin.

Li gor qanûna nû, ku di 28.02.1985-an de hate qebûl kirin, dê dersa zimanê zikmakî derveyî şemayê bête hiştin. Bi vî awayî dê zarok pir westiyayî werin dersa ya zimanê zikmakî. Eşkere ye, ku wê tu feyda vê hîndekariye tunebe. Programen hîndekarî yên ji bo zarokên biyanî ku ji alf hin belediyan ve hatine amade kirin, dersa bi zimanê zikmakî û dersa xebata serbest (friaktiviteter) tîne ber hev. Şagirt divê ji herdukan yet helbijérin. Di dibistanen Swêdi de, di dersa xebata serbest de gelek tiştîn ku şagirt jê hezdikin, têne çêkirin. Ji vê yekê ye, heger van herdu dersan day-nin ber zarokên biyanî, ew dê dersa xebata serbest helbijérin. Ne ji xwe armanc ji vê kirê ev e. Bi vî awayî belediye dê ji mesrefa rêkistina dersa bi zimanê zikmakî xelas be. Bi ya me, guhartinek weha ji hev cûdabû-nê teşvik dike. Bi vê guhertinê helbijartina bi serbestî ya biyaniyan têk diçe.

Armanca ev guhertinên ku hukûmet û belediye çêdikin, aborî ye. Ew dixwazin bi vê kirinê mesrefa xwe kêm bikin, tasarrûfê bikin. Lê belê ew bi dawiya vê kirinê qet nafikirin. Ew, gîhaştina pedagogî ku zarok bi dersa zimanê zikmakî bi dest dixin, dia-vêjin pişt guhêne xwe. Bi hiştina dersa zimanê zikmakî dervayî şemayê, danûstandina mamosteyê zimanê zikmakî û yên swêdiyan ji holê radibe.

Weke ku me li jorê jî da xuyakirin, armanc, gav bi gav îptalkirina reforma hîndekariya bi zimanê zikmakî ku ji dewletê re pir "biha" rûdinê, ye.

Di vî warî de min li bajarê Uppsala-yê ji kesên ku bi hîndekariya biyaniyan ve mijûl dibin, çend pirs pirsîn. Ez bersivêne wan bê gotar pêşkêşî we dikim. Bi xwe Swêd, welatê sêemîn e, ku Kurd dikarin bi zimanê xwe bix-wînin û binivsinin. Ji vê yekê jî divê ji bo mafê hîndekariya bi zimanê zikmakî têkoşîn bête kirin. Parastina vî mafî vatiniya her welatparêzekî ye.

Nemaze ji vî alî ve barek giran dike-ve ser milê Federasyona Komeleñ Kurdistanê Li Swêdê. Lê belê ya giring ew e, ku dê, bav û mamosteyen kurdî xwedî vî mafî derkevin. Ji vê yekê jî hêj nebûye dereng, divê xebatek xurt bête kirin. O

PIRS:

- 1- Ji kerema xwe, xwe bide naskirin.
- 2- Bi baweriya te ji bo ci hîndekariya bi zimanê zikmakî girîng e?
- 3- Di dibistanan de rola mamosteyen zimanê zikmakî çiye?
- 4- Hukûmeta Swêd dixwaze hîndekariya bi zimanê zikmakî ji holê rake. Gelo dîtina te li ser vê yekê çiye?

1- Navê min Gunnar Salomonsson e. Li bajarê Uppsalayê di Daïra Hîndekariya Biyaniyan de rektorê hîndekariye me. Ev 5 salê min in ku hem di dibistana destpêkî de hem jî di liseyê de ez vî karî dikim.

2- Belê, viya pêdivî dibînim. Qesda min ji hîndekariya bi zimanê zikmakî didu ne: hîndekariya alîkarî ya bi zimanê zikmakî (studiehandledning) û hîndekariya bi zimanê zikmakî (modersmolsundervisning). Bi ya min hîndekariya alîkarî ya bi zimanê zikmakî divê pêdivî be. Ev pêdivîti divê bi biryara mamosteyê zimanê zikmakî û mamosteyê Swêdî bibe. Eger ku babet hîndekariya bi zimanê zikmakî be, ez vêya wek meselekê şexsiyetê dibînim. Bi ya min divê zarok bi eslêne xwe û bi çanda xwe iftî-xar bikin. Vê imkanê jî zimanê zikmakî bi xwe dide.

Ji xwe li Swêdê, mesela hîndekariya bi zimanê zikmakî di politika kêmâyetî (ekaliye) de girîngiye xwe daye qebûl kirin.

3- Berê her tiştî mamosteyê zimanê zikmakî, di hîndekarî û fêrbûna zarokên biyaniyan de serkaniyekî pir girîng e û wan bi şiklekî erînî pêse dibe.

A duwemîn, mamosteyê zimanê zikmakî, di peydakirina danûstendi-

nên bi kesêñ xwedî çanda din de, serkaniyekî girîng e.

Bi ya min, divê mirov girîntiya dersa bi zimanê zikmakî wek dersa îngilîzî yan jî wek dersa teknîk bide famkirinê. Divê dersa bi zimanê zikmakî wek dersêñ bingehîn, derseke normal bête qebûl kirin.

4- Dema ez rewşa aborî ya dewletê tînim ber çavan, tasarrufkirinê pêdi-vî dibînim. Lê belê ev tişt divê eşkere bête gotin û listik jî divê eşkere bête listin. İro li Swêdê êrîşek mezin li ser hîndekariya biyaniyan tê kirin. Ji alî-kî din jî hem saetên biyaniyêng gehîşî û hem jî yên zarakan dixwazin kêm bikin. Lê belê armanc nayê eşkere kirin.

1- Navê min Kerstin Adner-Nilson e. Li Dibistana Grenbyê, di beşa bilind de ji bo şagirtên biyanî mamos-tetiya zimanê Swêdî dikim. Min di unîversitê de beşa zimanê swêdî wek zimanê biyanî (20 puan) xwendiyê.

2- Ji ber gelek sebeban belê. a) Di destpêkê de hevkariya mamossteyêng swêdî û mamossteyêng zimanê zikmakî pêdivî (hewce) ye. Mamossteyêng zimanê zikmakî, ji bo şagirtan ku ji alî ziman û çandê ve bi gotinêng biyanî têne êrîşkirin, serkaniyekî taybetî ye. b) Zimanê zikmakî girînge, ji ber ku zarok ew ji dergûşê bi dest xistîye. Ji aliyê din ve zarok tenê bi zimanê xwe yê zikmakî dikare hîs û danûstandinê xwe ronî bike. c) Dersa alî-karî ya bi zimanê zikmakî ji bo şagirtan ìmkana beşdarbûna li dersêñ bingehîn diafîrine. Ew zanistiyêng ku mirov li dibistanêng Swêdê dide zarakan, li welatêng din nayêng dayin. d) Mamossteyê zimanê zikmakî dikare sewiya zarakan bipîve.

3- Ji bo min mamossteyê zimanê zikmakî kesê ku zarakan ji nêz ve dinase û dijwariyêng wan dizane, ye.

Mamossteyê zimanê zikmakî dikare tiştên ku bi Swêdî ji zarakan re têngotin, ku ew fam dikin an nakin, kontrol bike.

4- Ji ber tiştên min li jor gotin, ez kirinêng hukûmetê çewt dibînim.

1- Navê min Gunilla Wrede ye. Ez di belediya Uppsala'yê de Rektora Hîndekariya Biyaniya me. Ez xwedî

du (2) zimanê me û ji sala 1968-an bî vir de bi hîndekariya biyaniyan ve mijûl dibim.

2- Belê. Di gotara UNESCO'ye ya li ser hîndekariya zarokêng bi du zimanî de weha tê gotin:

"Zimanê zikmakî ji bo ronîkirina hîs û daxwazêng mirov, aletek e û hewceyiya yekemîn a mirovîn pêşdebirina qabiliyeta ronîkirina hîsên xwe ye".

Di Programa Hîndekariya ya Swêdê (Lgr-80) de li ser vê babetê weha tê gotin: "Armanca hîndekariya bi zimanê zikmakî, divê parastîn û pêşdebirina zimanê ku zarok di jiyanâ xwe ya rojîn de bikartîne, be. Bi vî awayî mirov ji bo pêşdebirina hîs, ziman û intellektîya zarakan aîlkarî dike. Dîsa bi vî awayî zarok ìmkana bihevrebûna çanda dê û bavê xwe dibîne".

Hîndekariya zimanê zikmakî perçek ji mafêng mirov e. Bi vî mafî zarok danûstandina xwe bi dê û bavê xwe, yek bi yek mirovan re û bi mirovîn xwe re xurt dike. Ji vê yekê qalkirina girîngiye zimanê zikmakî û çanda dê û bavatîniya civatê ye û ev tiştekî pêdivî ye. Şagirtan ku ji bil zimanê Swêdî xwêdî zimanêng din in, ji bo civata Swêdî serwetek e û ji vê yekê jî divê bi çavek hûr lê bê nihêrtin.

3- Di dibistanêng Swêdî de girîngiye mamossteyêng zimanê zikmakî ji alî ziman û çandeyen ku li dibistanê têne temsîlkirinê, heye. Mamosstê zimanê zikmakî ji bo şagirtan ku li Swêdê nûhatî ne, di dinyakî nû de û ji bo pir pirsêng ku bersîvîn wan nehatine dayin, pişteke girîng e. Mamosstêng qenc li dibistanê dikare statûya zimanê zikmakî bilind bike. Ji aliyê din ve jî mamossteyê zimanê zikmakî di xebatêng navnetewî de faktorekî pir girîng e.

4- Hukûmet û parlamento, pişti reforma hîndekariya bi zimanê zikmakî tim li ser du fêlan listin. Ji bo ku şagirtan ku zimanê wan û zikmakî ne Swêdî ye, bibin bi duzimanî, ji helbijartina serbest, ji wekhevî û hevkarî gelek qal kirin. Afirandina kesêng bi duzimanî armanceke pir girîng e. Lê belê perên ku ji bo vê armancê hatine beşkirin pir hindik in. Ji vê yekê jî ji ciyêng ku mirov her roj van peran kêm bike û dersêñ zimanê zikmakî li derveyî şemayê bihêle, duris-tî ew e, ku mirov dev ji vê armancê berde. ■

GURÊ "AŞITÎXWAZ"

Li roja 6-ê tirmehê 1986-an, Kome-la Xerîbêng Ereb, ku komeleyeke kirê-girtiye û ser bi sefareta rêjîma Seddamîye û karê casusiyê jêre dike, sefirê Erqê li Stokholmê, Muhammed Seid El-Sehhaf gazî civînekê kir, ku semînarekê li ser aşitîyê bide. Ev xebera giha kes û hêzên welatparêz û demokratên Kurdistanê û Eraqê. Bi inisyatiya partiyêng CUD -Eniya Welatparêz û Demokrata Eraqê- kombûnek li ber deriyê ciyê "semînarê" sazbû. Pêtir ji sed kesan amede bûn û dijî rêjîma faşîsta Saddamî slogan bi kur-dî, erebî û swêdî havêtin, nizîkî du seetan li ber derî man. Dema sefirê Saddamî bi vê kombûnê zanî nehat, civîn û semînar jî têkçûn û kombûn bi sirûda neteweyî ya kurdî bi dawî hat. Federasyona me jî beşdarî vê kombûnê bû û roja paştır rojnameya Dagens Nyheter -ku mezintrîn rojnameya swêdiye- ev bûyer weke nûçeyek belav kir. ■

ŞEVEKE KURDÎ

Yeketiya Nişîmaniya Kurdistanê, li bajarê Stokholmê şeveke Kurdi pêk anî bi munasebeta deh saliya destpêkirina şerê xwe yê çekdarî dij rijêma faşîsta Bexda. Di vê şevê de axaftin, stranê kurdi, govendû dîlan û muzîk ji Emerika Latînî pêşkeş kirin. Bi qasî 500 kesî di şevê de beşdar bûn û heyâ nîvê şevê dom kir. Federasyona me jî ev mesaja pîrozbayî ji şevê re şand.

Hêzên pêşmerge serfi-raziyêng nû bi dest xistin

Li gor nûçeyen ku gêhiştin me, hêzên pêşmergeyên PDK-Îran, li Kudistana Rohilat, di mintiqâ Oşnavîhde êrîş bire ser leşkerê Îran û pişti şerekî xurt hemû kontrola mintiqê xiste destê xwe. Ser du seet dom kir û li dawî 60 leşkerên Îranê hatin kuştin û cebirxaneke mezin kete destê pêşmerge. ■

YEKİTİYA ZIMANÊ KURDÎ DIBÊ ARMANCA ME BE

Zinarê Xamo

Di Kongra Federasyonê a 6-an de birtyarek hat girtin, ku wê ji iro û pêve di Berbangê de Soranî bi elîfba Erebî jî bê nivîsandin. Hin nûner, li dij bi kar anîna elîfba Erebî derketin, lê piranîya Kongrê ev pêşniyar wek birtyarekê qebûl kirin. Û wek tê zanîn ev birtyara Kongrê di hejmara Berbangê a 3/86-an de hat bi cî anîn. Li gor baweriya min, di Berbangê de nivîsandina Soranî bi tîpên erebî ne rasste, birtyarek çewte.

Armanca birtyarê

Bê şik meriv dikare bipirse, gelo ji bona kîjan armancê ev birtyar hate girtin û argumentê hevalan ci bûn? Sebeb yek jê ev bû, Kurdên Soran nikarin Berbangê bixwînin, dema Berbang bi du elîfba derkeve, wê çaxê ewê ji kari bin bixwînin. Û ya din jî bi vê riyê, wê têkiliya wan û Federasyonê xurtir bibe û xizmetê ji hevkariya Kurdan re bike.

Rast e, Berbang ji alî Kurdên ji Kurdistana Iran û Iraqê ve nayê xwendin. Û dema çend rûpel Soranî bi tîpên Erebî derkeve dibe ku hin Kurdên Soran wan rûpelan bixwînin. Lî belê ev yeka, ji bona armancê dûr û dirêj, ji bona nêzibûn û yekbûna Kurdan tu feydeyek siyasî bi xwe re nayne. Ji ber ku, yêni bi tîpên Latinî dizanin wê cardin besê Latinî bixwînin û yêni bi tîpên Erebî dizanin jî wê besê Erebî bixwînin. Û ji xwe iro jî rewş waye, kî bi kîjan elîfbayê dizane ji xwe re wan weşanen dixwîne. Lî dema Soranî bi tîpên Latinî bê nivîsandin, berî her tiştî wê Kurdên Kurdistana Bakur jî kari bin bixwînin, ev jî di warê siyasî de gelek muhîme. Li gel viya wê Kurdên Soran jî hêdî hêdî fêri tîpên Latinî bibin. Ev yek, ger demek dirêj bajo jî, lê di rojêne pêş de wê fêrbûna xwendin û nivîsandina Kurmancî jî bi xwe re bîne. Ji xwe hemû Kurdên Soran jî berê de bi elîfba latinî dizanin -yêni çûne dibistanê-, ya muhîm, ewe ku wê çawa bê fêrbûn û bê guman, hinekî jî xwe êşandin!

Lî belê feydeya nivîsandina bi elîfbakê bes ne ev e, dema Kurmancî û Soranî bi elîfbakê bê nivîsandin, em bixwazin ne xwazin, wê her du lehçe

jî gotina ji hev bigrin û bêtir nêzî hev bibin. Kurmancê kari bin ji eserên, nivîsarên Soranî feydeyê bibînin û Soran jî ji yên Kurmancî. Karekî wisa wê ji yekîtiya zimên re xizmetê bike. Mesela, Kurmanceki ku têkiliya wî bi Kurdên Soran re çê bû be, ji yekî ku qet têkiliya wî çê ne bû be bêtir Soranî dizane, ya jî tê dighîje. Dema wisa ye, gelo çîma em ji dêlî karê hêsatir, karê rasttir nakin?

Her tiştî ji bo nêzik bûn û yekîtiya Kurdan

Me di serî de goti bû, armanca vê birtyarê yek jî ev bû ku derketina Berbangê bi du elîfba wê Kurdên ji Kurdistana Iran û Iraqê jî "bikşîne nav xebata Federasyonê" û ev yek jî wê ji hevkariya Kurdan re xizmetê bike. Ev ne rast e. Bi vê riyê Federasyon nikare Kurdên Soran bikşîne nav xebatê û têkiliya xwe bi wan re xurt bike. Ji bona gîhiştina vê armancê berî her tiştî dibê em -Kurmanc û Soran- ji zimanê hev fam bikin. Û hetanî ku em ji zimanê hev fahm nekin û em nikaribin weşanên hev bixwînin, emê nikarin nêzikî hev jî bibin. Lî dema em ji zimanê hev fahm bikin -Qesda min bi viya, xwendin û nivîsandina her du lehçaye, ne ku di warê axaftinê de bi carê de em ji hev fahm nakin- ne bes emê bi hev re kar bikin, emê bêtir ji bona hev bişewitin jî. Yanî, ewê ruhê netewî di nabêna me de xurtir bibe, emê bêtir ji hev hez bikin. Û ev yek jî, ji xwe ber çê nabe, dibê polîtikak me ya rast hebe.

Wek tê zanîn hêzên dagirkir wela-tê me bi darê zorê xistine bin destêne xwe û her dewletekê ji bal xwe de gelê me mecbûrî fêrbûna ziman û elîfba xwe kirine. Ev hovîtiyek li derî irada me û bi zor hatiye kirin. Ev rastiye-ke. Lî belê ev nayê wê manê ku em ji binde nikarin tu tiştî bikin. Em iro nikarin dijmin ji welatê xwe derxin, lê em dikarin elîfbak yekbûyî fêr bibin. Ya muhîm dibê em ji derekê dest pê bikin.

"Zilamek û Zimanek"

Bê şik fêrbûna elîfbake nuh ne hêsa

ye, jê re xebat û fedekarî dibê Em viya dizanin. Lî esas ya muhîm, di vî warî de Berbang dikare ci rolî bilîze? Bi baweriya min, di warê pêşdebirin û yekîtiya zimanê Kurdî de ew dikare rolekî mezin bilîze. Ji ber ku hin kovar û rojnaman di dîroka netewan de rolên mezin listine. Li ser vê yekê di Hawarê de nivîsek gelek enteresant heye. Navê nivîsê, "Zilamek û Zimanek" e. Nivîs bi kurtayî wisaye:

Li Rûsyayê Cihiyekî bi navê Ely-ezer bin Yehûda heye, fêri zimanê xwe dibe û di sala 1878 an de dihere Parîsê. Li Parîsê bi Cihîyan re têkiliye datîne û zimanê xwe pêş ve dibe. Dixwaze ku Cihîyan din jî İbranî fêr bibin. Lî gelek caran Cihî "lê radi bin" û dibêne dîne. Ji ber ku wê demê İbranî wek Latinî êdî zimanekî "mirî" ye. Lî Elyezer bin Yehûda dev jê bernade, di sala 1881 ê de bi keça mamostê xwe re dizewice û dihere Filîstînê. Li wir, ew û jîna xwe bes bi İbranî dipeyivin. Û dema zarokên wan jî dîbin, bi wan re jî bes bi İbranî dipeyivin. Di dû re rojnamakê derdixe û ji xwe re xwendevan jî dibîne.

Di sala 1922 an de Elyezer bin Yehûda dimre, lî zimanê İbranî yê ku berî 30-40 salî mirî bû, êdî bû bû zimanê miletekî. (Hawar, rûpel 624-625, Herekol Ezîzan. -Herekol Ezîzan Celadet Bedirxan e-) Belê, li gor van gotinêñ jorîn ew zimanê ku berî viya bi sed salî mirî bû, iro bûye zimanê dewletekê. Bê guman rewşa zimanê Kurdî ne hewqas xerab e û ne jî dijwar e. Lî bi vê mînakê min xwest ku viya diyar bikim: Dibê meriv tu carî rolê kovarekê biçûk ne bîne, yanî mirovek û kovarek jî dikarin tiştîn gelek mezin bikin. Bes dibê ew sebr û istîkrara "Elyezer bin Yehûda" bi meriv re hebe. Û di vî warî de Celadet Bedirxan û eserên wî bi xwe, ji bona me Kurdan mînakek bê hempa ye. Gelo ew jî wek yêni dina bifikiriya û bigota "Elîfbak yekbûyî fêr" û dest bi nivîsandina Latinî ne kira, wê çawa bîba? Bi iştîmalek mezin, me yê jî iro wek Kurdên Soran bigota "fêrbûna tîpên Latinî dijwar" e.

Tîpêñ Erebî bersîva zimanê Kurdî nade

Di warê rîzimanî de nivîsandina Kurdî bi tîpêñ Erebî gelek dijware. Li ser vê dijwariyê di Ronahiyê de mînakek pirr xweş heye. Ronahiyê nameyek Elaedîn Secadî ji Gelawêjê wergeranî diye tîpêñ Latînî. Lê di wergerê de hin cewtî bûne, loma ji Ronahî vê notê dixîne: "Tiştên ku bi tîpêñ Erebî tête nivîsandin, divêt mirov wî seh bike û tê bigehe da ku bikare wî bixwîne. (...) Yanî bi tîpêñ erebî beriya çavan mejî dixebe û xêra vê xebatê çav dibînin û lêv dilivin. Heçî tîpêñ Latînî, di wan de çav rast bi rast û bêî mihakema mejî dibînin, ziman digere û paşê mejî bi kêfa xwe dixebe, tê digehe." (Ronahî, hej.5, rûpel 12.) Yani tîpêñ Erebî çawa têñ dîtin wer nayêñ xwendin, dikare bi çend maneyêñ cuda-cuda bêñ xwendin. Minak, di elîfba Erebî de hin konsonant (tîpêñ wek J, P, V, G, Ç,) û vokalên ku di zimanê Kurdî de henin, tune ne. Her çiqas Kurdêñ Soran di vî warî de hin "deng" û "tîp" çêkiri bin jî lê, cardin tîpêñ Erebî di vî warî de nikarin hewcedariya Soranî bi cî bînin. Em tîpa "i" bigrin, di elîfba Soranî a nuhu tê nivîsîn de ev vokal tuneye. Loma jî, "min" bi hawê "mn", "dibirin" bi hawê "dbrn" û "bibin" jî, bi hawê "bbn" tê nivîsandin, lê dibê meriv zanibe rast bixwîne. Gelo elîfbak wisa dijwar û bi gelek hawî ku nikare bersîva zimanê me bide, cîma em naxwazin rojekê pêş de xwe jê xelas kin?

Ma dibê em qet bi tîpêñ Erebî fêr ne bin?

Dikare bê gotin ku, ma dibê Kurdêñ Kurdistana Bakur bira fêrî tîpêñ Erebî ne bin? Na, tiştîki wisa nabêjim. Lê baweriya min ewe ku ji gel daxwazek wisa kirin, him ne realist e û him jî ne rast e. Lê li gel viya, her Kurdê ku bi siyaset, ziman û edebiyatê mujûl dibe, dibê fêrî tîpêñ Erebî bibin û karîbin Soranî bixwînin. Lê dibê armanca me hemuya fêrbûna xwendina bi tîpêñ Latînî be.

Gotina min a dawiyê, ji bona elîfba û zimanekî yekbûyi dibê em, ne karê hêsanîr, lê yê rasttir bikin. Û wek têzanîn, "ji bona idîalêñ mezin fedekariyêñ mezin divê." Ez bawer dikim ku di vî warî de Berbang jî dikare gelek tiştî bike.

Li Kurdistana Başûr



Pêşmergeyên qehreman li çiyayêñ Kurdistanê

Foto: S. Zaxoyî

DI 40 SALIYA TEKOŞINA SIYASİ Ü DI 25 SALIYA ŞERÊ ÇEKDARİ DE SERFIRAZÎ SERKETİNEN NÛ

J. Rexnegir

Di van mehêñ dawî de, li Kurdistana Başûr tekoşına siyasî ya natewîyê kurd 40 saliya xwe û ya şerê çekdarî ji 25 saliya xwe tije kir. Li Kurdistana Başûr, hêzên pêşmergên PDK, di 40 saliya tekoşına siyasî û di 25 saliya şerê çekdarî de, şerê rizgarî yê netewî hîn jî, jîndar, ges û gurtir kir. Pêşmergeyê gernas û mîrxas bi zora çek roj bi roj qad û çarçova xaka azad fireh û mezin dike.

Li gor agahdarî û nûçeyêñ ku ji Kurdistana têñ, di van rojêñ dawî de, hêzên pêşmerge, di çeperêñ şer de serketin û serfirazîyê mezin û hêja bi dest xistin û dixin. Pêşmergeyê kurd, gelek herêm, gund, navçe û bajar azad û rizgar kirin û dikin. Çend heftê berî hêzên pêşmerge, bi dilekî pola û bi mîrxasî êrişkeke dijwar, mezin û giran birin ser hêzên leşkeriyê İraqê û caşan. Bi taybetî şer li dor bajarê Mangêşê û Dihokê ges û sor bû. Pişî sê rojan pêşmerge bajarê Mangêş rizgar kir. Pêşmergeyê gernas û mîrxas hêzên leşkerê İraqê bi caşan ve belav-welav kirin. Ji 100 û bêtir leşkerê İraqê hatin kuş-

tin û 800 leşker ji dîl bûn û xwe spar-tin hêzên pêşmerge. Hêzên pêşmerge, 2 tang, çekêñ li dij balafiran û gelek çekêñ giran yên din bidest xistin. Ü herweha niha sêgoşa tixûbêñ Tirkîyê, Suriyê û İraqê, ket bin bandora hêzên pêşmerge.

Li aliye din, li herêma Bahdînan, li derdora bajarê Newroz, Kerkuk, Hewlêr û yên din jî, her ku diçe şer ges, gur û giran dibe. Pêşmerge her roj pêşve dimeşe, qada herêma rizgar hîn ji fireh dike. İro, herêm bi seran-ser di bin kontrola pêşmerge de ye. Dewleta İraqê ya nîjadperest û paş-verû li ser heremêñ rizgarbûyi, ica abloke û ambargo ya aborî pêktîne. Dewleta Tirk a fasîst jî li ser tixûbê xwe û İraqê, lek bi lek leşker bi cîh dike. Saw û tirsa pêşmerge ji zû ve ketiye çok û dilê wan jî. Lê pêşmergeyê gernas û mîrxas, ji bo parastîna xaka rizgar û azad, ji her êrşî û şerî re amade ye. Di pey 25 salan de şikes-tina şerê çekdarî çîrok û xeyal e. Rojêñ serfirazî û serketinê êdî nêzîk in!

NİJADPERESTAN RONNY LUNDİN, 21 SALÎ, KUŞTIN



Civîna dijî nijadperestiyê li Stokholmê, 3.7.1986

Foto: MAGNUS HARTMAN

Ronny Lundin, 21 salî, li dijî erîşa grûbekî nijadperest, ku erîşî çend biyaniyên bêmudâfa dîkirin derket, hate kuştin.

20-ê Hezîranê, roja orta havînê, her sal li Swêd bi giştî tê pîrozkirin. Xelq derdikeve der, li ser heşinayîye bi dîlan û stranan vê rojê pîroz dîkin. Biyaniyên ku li Swêd dijîn jî bi xelqê Swêdre tevî vê cejnê dibin.

Karkerê ciwan, Ronny Lundin, îsal xwestibû cejna orta havînê tevî hevalên xwe li Nyneshamnê (Belediyeke Stockholm) pîroz bike. Li ciyê cejnê, grûbek nijadperest (skinnhead) erîşê çend biyaniyan dîkin. Ronny û hevalên wî, dixwazin birayêن xweyi biyanî ji erîşa nijadperestan biparêzin. Lê Nijadperest Ronny dikujin û hevalên wî jî giran birîndar dîkin.

Çend roj berî kuştina Ronny Lundin, pîrekek, endamê meclîsa belediya Orebro, li ber mala xwe ji alî nijadperestan hate hingavtin.

Ev êrşêن nijadperestan ne yên cara yekem bûn. Bêşik ew ne yên dawiyêne jî. Lê tiştê kesnedî eve, ku hîn li Swêd qanûnek li dij nijadperestiyê tune. Partiya Neo-Nazist li Swêd serbest kar dike. Herçend Swêd li bin peynama Koma Netewan a li dijî nijadperestiyê imza xwe avêtibe jî, lê li gor wê peymanê ne xwediyê qanûnekêye. Berpirsyarêن hukumetê dibêjin, ku eger em rêxistinên nijadperest qedexe bikin, wê çaxê ew rêxistinên nijadperest wê bi dizî kar bikin û kontrola wan wê zehmet be. Lê em ne di wê baweriyêdene. Divê rêxistinên nijadperest û nijadperestî bêne qede-

zekirin û kesen ku nijadperestiyê dîkin bi xurtî bêne ceza kirin.

Li dijî kuştina Ronny Lundin, Federasyona Dijî Nijadperestiyê, di 3-ê Tirmehêde civîneke protestoyê amade kir. Di civînêde dora hezar kes civiyabûn û nijadperestî hate rûres kirin. Federasyona me jî di civînêde besar bû û ev mesaja jêrîn xwend:

Îro em li vir cîvîane, jî bo ku em nefreta xwe û bi bîryariya xwe li dijî terorizma nijadperest û rasîstan, ku karkerê ciwan, Ronny Lundin kuştin, nîşan bidin.

Ronny ji nihade sembole ji bo me di têkoşîna li dijî nijadperestiyê. Herweha ew sembola piştgiriyê di nav swêdiya û biyaniyande.

Ronny Lundin di nav mede dijî.

JI KOMELÊN ENDAM JI KOMELÊN ENDAM

LI SER JIYANA KURDAN A ROJANE DE RAXISTINEK

Li pirtûkxana bajarê Bollnesê raxistinek li ser jiyana Kurdan a rojane hat vekirin. Raxistin, ji alî Komela Kurd Li Bollnesê hate vekirin û ji 9-ê Gulanê heta 16-ê Gulanê domkir. Di raxistinê de him jiyana Kurdan a rojane û him jî kultura wan bi hawakî delal bi hev re hatiye girêdan û pêşkêşî rûniştvanên Bollnesê bûye.

Rojanama "Ljusnan"ê, di hejmara xwe a di roja 10-ê Gulanê de cî da raxistinê û wisa nivîsand:

—Sûret him xweşik in û him jî bi xof in. Sûretên ku dilan, cejn û destkirên kurdî nîşan didin idêalin. Lê sûretên ku êşkêncê û girtiyan nîşan didin, ji romantizmê bêtir her tişt in. Ew nîşan didin wekî leşkerî Tirk çawa li meydanekê, vekirî êşkêncê dikin, jinan bi zora silahan digrin û herweha ewêñ ku gulle lêketiye.



Ji raxistina li ser jiyana kurdan

Foto: Thomas Froms

Kovar û rojnameyên derbarê Kurdistanê û têkoşîna wê ji bo serxwebûnê

li dijî kolonyalîzmê, emperyalîzmê û faşîzmê jî gelek in.

Muzîka Kurdî Bala Swêdiyan Kişand

Di 8-ê Hêzîranê de li bajarê Bollnes şevez Kurdî a muzîkê hat çekirin. Şev, ji alî ABF (Rêxistina Perwerde-

kirina Karkeran) û Komala Kurd li Bollnes hatibû hazır kirin. Di şevê de, grûba Kîkî û Nûrî bi hawakî gelek



Nûrî û Kîkî stranên kurdî pêşkêşî mêvanan dikin

Foto: Bjorn Hanerus

xweş muzîka Kurdî pêşkêşî mîvanan kirin. Muzîk û stranên Kurdî geleki bala mîvanan kişand. Herweha koma Komela Jinên Demokratên Kurdistanê Li Swêd a dilanê jî ji Stokholmê çû û besdarê şevê bû. Endamê Komela jinan, Kulîlkê jî bi dengê xweyê xweşik şev dewlemendir kir.

Rojnama "Ljusnan" di hejmara xwe ya roja 9-ê Hezîranê de bi vî awaî bahsa şevê dike:

Şeva kurdî li Bollnesê nîşan da, ku ne tenê Swêdî gelek kesan kom dikin. Di şeva Kurdî de gelek kes kom bûbûn -ji texmîna amadekaran jî bêtir. Doreke gelekî diêj çêbûbû li ber masa xwarina kurdiye xweş.

Herweha di rojnama "Ljusnan" de berpirsyarê ABF, Magnus Bergvall, derbarê şevê de úsa got:

—Bê şik bi vî yekê armancek me heye. Em dixwazin ku karekî bikin ku Swêdî û Kurd bikaribin hevûdu bibînin û kultura hev nas bikin. Ji bona gelekan urf û adetên Kurdî xerîb in û ev nezaniyêñ úsa jî bi hêsanî dîbin sebebê dijitiyê. Hêvî dikim ku wê ev şev, bibe alîkar ku li Bollnesê gelşen o bi vî rengî çê nebin.

ELÊN ENDAM JI KOMELEÎN ENDAM JI KOM

MALBATÊN KURD LI HAVÎNGEHÊ

Di navbera 29-ê Hezîranê û 11-ê Tirmehê, 50 malbatên kurd li Uppsala-yê -170 kes- vexta xwe li havîngehê derbaskirin. Malbat li ser sê grûban hatibûn parvekirin. Her grubek (50-60 kes) 4 rojan li havîngehê man. Havîngeh, xaniya Xaça Sor û di daristanê de li ber avê bû. Her grûbê, karê xwe: çêkirina xwarinê, paqîkirin bi xwe dikir. Rojê pênc kes berpirsiyare vê karê bûn. Ên din jî wextê xwe bi gerê, sobayî û vêsandinê derbas dîkirin. Bi her grûbekere, berpirsiyarek ji bo zarakan hebû. Pedagog û mamosteyên kurd, heval Doxan, Fadil û Elî (serokê Komala Kurdistanê li Uppsalayê) berpirsiyaren zarakan bûn.

Di hundirê van rojan de, ji bo herdu grûbê pêşin li ser zimanê zikmakkî semîner hate dayin. Ji bo grûba yekemîn Alî Zerdeş û Bareş Battê, ji bo grûba duwemîn Şemal berpirsiyaren semîneran bûn. Ji bo grûba sêemîn jî sohbetek li ser rewşa jinan hate kirin. Herweha di van rojan de ji bo her grûbê filîmên video li ser Kurdistanê hate nîşandan.

Havîngeh, ji aliye Komala Kurdistanê Li Uppsalayê, pedagogên malbatên kurdan li Uppsalayê û pedagogên pêşxwendegeha kurdi li Uppsalayê hatibû amade kirin. Belediya Uppsalayê jî alikariya aborî ji bo vê karê dabû.

Amadekarên havîngehê, serokê Federasyonê Hanefî Celeplî jî dawetê havîngehê kiribûn. Heval Hanefî, wexta xwe bi grûba dawîre derbas kir û roja dawî ji berpirsiyaren havîngehê, Şoreş Bladhede û Alî Zerdeş derbarê armanca vê karê hêja û rêxistîniya wê pirsên jêrîn kirin. Her weha ji malbatên kurda jî derbarê havîngehê, bîr û baweriyêن wan pirsîn.

ARMANCA HAVÎNGEHÊ

Heval Şoreş, karî çend gotinan li ser armanca amadekirina havîngehê bêji?

-Belê. Piraniya malbatên kurd li Swêd, wek grûbêni biyanî yên din havînan nikarin biçin welatê xwe. Gelek ji wana nû hatine Swêdê û muhtacê vêsandinêne. Kurdên ku li Uppsalayê dijîn, ji mintiqêن Kurdish-

karê bibin serî an na. Vaye, di roja dawîde ez dikarim bêjim ku me ev kara bi serfirazî bire serî. Em hêvî dîkin di salêن pêş mede, Federasyona me wê bi hevkariya komelêن xweyî endam inisiatîva karekî ûsa bigre û tu malbatêن me li derve nemînin.

Sipas.

Heval Elî, karî çend gotinan li ser rexinîkirina karê zarakan di havîngehê bêji?

-Serçava. Bi her grûbek malbatre me grûbeke zarakan jî çêkiribû. Berpirsiyare grûba yekem heval Doxan, ê grûba duwem heval Fadil û ê siyem jî ez bûm. Ez bi xwe bi grûba yekem û duwemre jî besdar bûm û min alîkarî kir. Her weha min li ser navê Komela Kurdistanê li Uppsalayê, pîrsen malbatên kurd guhdarî kir. Ew jî gelekî kêfxweş bûn. Ji bo salêن pêşiyê jî em tiştê ûsa difikirin. Tu kême-



Malbatên kurdan piştî xwarinê li derva qehwê vedixwin

tanê cure cure hatine. Em pir pêwist dibînin, ku ew di civata Swêdde têkiyyen xwe bi hevre xurt bikin. Herweha me xwest ku malbatên me jiyanâ kollektîvî hîn bibin, hîsê berpirsiyarey li cem wan xurt bibe.

Daxwazeke xurt di nav malbatên kurdde hebû ku werin havîngehê. Lî ûmkanên me rê nedan, ku em ji 170 kesî bêtir bikin mîvan. Ev cara yekem bû, ku me li Uppsalayê inisiatîva karekî ûsa girt. Di destpêkêde gelek şikên me hebûn, wekî emê vê

siyên me berbiçav çênebûn. Her tiştî bi serfirazî derbasbû.

Ji bo zarakan materyalê me ên lisistikê kêm bûn. Lewre jî me wextê xwe bêtir di tabiatêde derbaskir. Me zerok tev kir yek grûb. Di nav tabiatêde, navê tiştan me bi kurdi hînî zarakan kir. Em listikên kurdi hîn bûn. Me stranê kurdi bi koro stran. Me çîrokênen kurdi ji zarakanre got. Ji alî ziman de pir baş bû. Di van rojan de tenê kurdi hate axaftin. Me herroj sibêhê cimnastîk kir. Em çûne avje-

JI KOMELÊN ENDAM JI KOMELÊN ENDAM

niyê.

Di van rojande dan û standina zarokan bi hevre gelekî xurt bûn. Zarokên bi emir mezin, berpirsyari-

ya yên piçukan dan ser xwe. Vê yekê zarok hînî berpirsyariye dikir. Zarokan xwarinê xwe di wextêni diyarde xwarin. Dê û bav gelekî kîfxwes man.

Daxwaza wan ji bo careke din ew bû, ku çar roj kêmîn, gerek wexteke dirêjtir be. Spas.

MALBATÊN KURDAN JI HAVÎNGEHÊ RAZÎNE

Diya Doxan:

-Gelekî başbû. Xwedê ji we razîbe. We xwarin çekir û me jî xwar. Em çûne ber avê. Hûn li zarokan xwedî derketin. Em kenînî, me demeke xweş derbaskir. Axaftina li ser pirsa jîna pir baş bû. Min tu kêmâsi nedîn. Eger te dîtiye, bêje!

Diya Roza:

-Tatîleke ûsa pir pêwîst bû. Herçend ji alî rêxistinîde hin sistî hebûn jî, lê ez pir razîme. Ji bo zarokan gelekî baş bû. Di rêxistinîya karê zarokande hin kêmâniyêne me hebûn. Materyalen îstikê tunebûn. Zarokan di salênen cure curede di grûbekîde hatibûn komkirin. Ji alî ziman de pir baş bû. Di Rojê destpêkêde hin zarokan bi swêdî diaxiftin. Lê dûre tenê bi kurdî ahaftin. Zarokan hevdû nasdi-kirin. Di vê warîde pir posîtîv bû. Divê ji bo salênen pêşiyê em karêna ûsa baştır rêxistinî bikin.

Diya Lezgîn:

-Gelekî baş bû. Him ji bona zarokan û him jî ji bona mezinan û kal û pîran. Li welatekî ûsa hatina cem hev hewcekiyeke mezine. Pêwîste meriv salê du car bêni ciyêna ûsa. Ez bi xwe ji sê zarokan azad bûm û min karî hinekî îstrehet bikim. Ji alî dinde zarokan firset dîtin bi hevre bi kurdî bipeyivin, hevdu nasbikin.

Diya Sûltanê:

-Belê pir xweş bû. Me hevalen nû naskirin. Tu şikyatêne me tunebûn. Ji bo zarokan jî pir baş bû. Em gelekî ji we razîne. Hûn ji me razîbin bese.

Diya Bêkes:

-Welle em pir bi kîfxwesin. Ew çend rojan me pir bi kîfxwesi derbaskirin. Di van rojande me gelek tişti ji bîrve kirin. Duhu li ser mesela jîna me peyi-



Grûbek ji malbatên kurdan

vî. Ew tiştekî baş bû. Me li mala xwe nedikarı zarokên xwe ûsa baş xwedî bikin. Ji bo her tişti gelekî spas. Em bi taybeti ji kek Elîre spas dîkin. Wî zarokên me baş xwedî kirin.

Diya Şilanê:

-Başbû kekê, spas. Gelekî xweş bû. Welle kekê, Zarokên me xwedî kirin, gerandin. Zarokan tenê kurdi peyivî. Hûn her bijîn. Kêfa me gelekî hat. Me malbatên nû naskirin. Ev tişta jî gelekî baş bû.

Apo:

-Jiyana bi hevre xweşe. Qebûl jî bûye xweşîya wê. Ez dixwazim hin tiştan bêjim. Me divaba jiyaneke ûsa di welatê xwede derbasbikira. Min ji pîreka xwe pîrsî ka ew çîma ji vira ne raziye. Wê go: -Ma ev xweşbûn ya welatê mine? Bi rastî jî pêwîste em vê xweşikbûnê di welatê xwede çebikin.

Diya Arjen:

(Seroka seksiyona jinan a Komela Kudistanê li Uppsalayê.)

—Ji bo pîrekan rojêna ûsa pir başe. Di jiyana normal de têkiliya jinan bi

hevre pir qelse. Ji ber ku herkes li mala xwe bi karê xwe û zarokên xwe-re mijûle. Lê rojêna ûsa firseteke pir başe, ku pîrek bêne cem hev, pîrsên xwe bi hevre muneqeše bikin. Herweha pir başe, gava jin carna ji zarokan azad bibin. Ji alî hînbûna karê kollektîvî, rojêna ûsa pir pêwîstin. Ji bo zarokan jî imkan çêdibe, ku hevdu nasbikin û bi hevdure kurdi biaxifin. Lewra zarokên me di jiyana normalde bêtir tevî zarokên swêdîne û zimanê swêdî bêtir diaxifin. İro çar rojin em li virin, ez xwe wekî li welêt hîs dikim. Di van rojande me ji kurdî pêve tu zimanen din nebilîstin. Jinênu ku li vir beşdarin, hemû endamên seksiyona me ne. Çar roj kême. Divê wext dirêjtir be.


Bavê Arjen:

-Di van çar pênc rojande tu problem derneket. Di grûba mede, ji nexwendîya bigre ta bi akademîsyen hene. Ez gêhiştîm wê neticeyê, ku ronakbîrên me dikarin tevî gelê xwe bijîn. Ji karêna ûsa meriv dikare gelek tiştan fêr bibe.

Komela Kurdistanê Li Uppsala yê şêhîdên 1925-a bi bîr anî

Ji bo bi bîranîna şêhîdên 1925-a, Şoreşa Şêx Seîd, Komela Kurdistanê Li Uppsalayê di 1-ê Hezîranêde civînek amede kir. Nivîskarê kurd M. Emîn Bozarslan bi vî munasebetî, li ser şoreşa Şêx Seîd sêmînerek da. Herçend ewî bi xwe di destpêka semînêrede got, wekî ev sohbeteke, lê di axaftina xwede wî gelek malûmaten giranbiha da civînê û bi dûr û dirêj li ser serhildana Şêx Seîd sekinî.

Di dawiya civînêde jî M. E. Bozarslan, "Beyannama Şêx Seîd" xwend û diyar kir wekî armanca serhildanê serxwebûna Kurdistanê bû. Ev beyanname di hejmara kovara "Roja Nuwê" a 7-ande, di sala 1960-îde hatiye weşandinê.



M. Emîn Bozarslan diaxive

Dêra swêdî malbatêñ kurd vexwendin havîngehê

Di 3-ê Tirmehêde, dêra swêdî li Bollnesê, malbatêñ kurd vexwandin havîngeha dêrê. Li wir, kurdan û swêdiyan roja xwe bi hevre derbas kirin: xwarin vexwarin û dûre jî stran û dîlanê xwe pêşkêşî hev kirin.

Rojanama "Ljusnan"ê, di hejmara xwe a 5.7.1986-ade, ji bo vê rojê nîv rûpel veqatandiye û bi bi hewaskarî pesnê dilanê kurdî, ku zarokêñ kurd pêşkêş kirine, dide.

Burjuvaziya Tirk carek din xwe kir pêkenînê cîhanê

Reşoyê Qerejdaxî

Li Tirkîyê di dawiya sala 1985-an de hejmartinek nufûsê (îstatistik) ya bi tevayî çê bû. Enstîtuya Dewletê ya İstatistikê (EDİ) ji bona hejmartinê nufûsa di nabêna salên 1980 û 1985-an broşûrek bi navê "Pirtûka Dest a Mamurêñ Hejmartinê" weşandibû. Di vê broşûra EDİ de pîsek heye, dibêje: "Bêî zimanê diya we-Tirkî-hûn bi zimanekî din baş dizanîn?" Û di dû re jî çend ziman mînak dane, gotine, "ji Ingilîzî, Fransîzî, Erebî û Kurdi yekî işaret bikin." Him pirs û him jî bersîv bi hawakî wisa "hîmî" hatine hazır kirin, ku yekî Kurd jî zimanê diya wî dibe "Tirkî". Gotine, ku "Bêî zimanê diya we-û ji xwe zimanê hemû kesen ku li "Tirkîyê" dijîn Tirkî hatiye qebûl kirin-hûn bi zimanekî din baş dizanîn?" Lê li aliyê din jî, Kurdi û Erebî jî wek Ingilîzî û Fransîzî kirine zimanen biyanî. Îcar li gor vê bersîvê hemû gelên li "Tirkîyê" dijîn, zimanê wan ji xwe Tirkî ye(!) û zimanê diya wan jî biyanî ye. Dema yekî Kurd di bersîva xwe de bibêje erê, ez bi Kurdi dizanim jî, ev tê wê manê ku ew, Kurdi wek zimanekî biyanî -wek Fransîzî, Ingilîzî- dipekiye, ne wek zimanê diya xwe. Ji ber ku bersîv li gor netîcak wisa hatiye hazır kirin. Lê belê bi vî hawî pîrsîn jî súce: súc e, ji ber ku navê Kurdi derbas bûye.

Belê, piştî derketina vê broşûrê hêzên şovenîst har û dîn bûn, dozkarê -mudümümûm- nûjadperest di derheqê 11 mamûren EDİ de dawe vekir û ji wan re di nabêna 5 û 8 salan ceza xwest. Dozkarê leşkerî, di doznama xwe de dibêje ku van 11 kesan bi pîskirina "hûn bi Kurdi dizanîn", "Kurdparêzî û parvekarî" kirine û xwestine ku "hisîn millî qels û wenda bikin."

Dozkarê leşkerî, di doznama xwe de dibêje: "li hin herêmên Tirkîyê hin lehçeyên zimanê Tirkî wek Tatarî, Çerkezî û Lazî" her çiqas henin jî, lê vana di broşûrê de ne hatine nivîsandin. Û li aliyê din "Kurdi -ku lehçek Tirkî ye- bi qesî nivîsandine û bi vê

yekê jî xwestine Tirkîyê perçê bikin, loma jî dibê ceza bibin." Wek me dît, dozkarê şoven ji "Erebî, Tatarî, Çerkezî û Lazî" aciz nabe, nivîsandina van zimanen Tirkîyê "perçê" naake û nabe parvekarî. Lê nivîsandina Kurdi, wî û dewleta wî ditirsîne, radike ser tapana. Bê guman ev tirsa hêzên kolonyalist û faşist ne bê sebeb e. Ji ber ku ew dizanin, nivîsandina "Erebî, Tatarî, Çerkezî û Lazî" iro tu tahlûkê bi xwe re nayne, ew bêñ nivîsandin jî neyîn nivîsandin jî tu tişt ji wan xera nabe. Ma "qebûl kirina" hebûna zimanê Kurdi wisaye? Bê şik ne wisaye. Ew wek "îmana" xwe baş dizanin, ku dema "hebûna" Kurdi qebûl bikin, dibê "hebûna" gelê Kurd jî qebûl bikin. Û loma jî burjuwaziyê Tirk zimanê me û hebûna gelê me bi hemû hêza xwe înkâr dike.

Baş tê zanîn, di şerê cîhanê yê yekem de dema hêzên emperyalist ketin Tirkîyê û şerê burjuwaziyê Tirk keti bû tengayê wan wisa eşkere hebûna gelê Kurd înkâr nedikir, digot Kurd û Tirk du netewên bira ne û wê mafêñ wan jî wek hev bin. Li ser vî esasî, Mustafa Kemal ji şêx, beg û axên Kurdan re name dinivîsand, di namêñ xwe de destê wan radimîsa û ji gelê Kurd alîkarî dixwest. Di meclîse de serokê Kurdan dida axaftin û ji wan daxwaz dikir ku ew bi kincêñ Kurdi bêñ meclîsê. İsmet Înonu di Konferansa Lozanê de digot: "Hukûmeta Tirkîyê bi qasî ku ya Tirkî ye, hew qasî jî ya Kurda ye." Pessîne Kurdan dida û digot, "Milletê Kurd qehreman e, esîl e..." û.h.w. Lê iro jî dema navê Kurd dibihîzin, di cî de vediciniqin, ditîrsin û wek Berkleyê keşî dest bi înkariya her tişti dikan.

Lê ez sond dixum bi serê şêhîdan, bi navê Kurdistan, gelê Kurd wê vê tirsa wan bi rast bigerîne, Kurdistanê rizgar û gelê Kurd jî wê azad bibe. Ew ji tirsa têkevin binê erdê jî lê wê cardin vê rojê bibînin, ema iro ema sibe...!

ŞAIREK Ú HELBESTEK

Ebdilrehman Mizûrî

Ebdilrehman Mizûrî, şair û nivîskarekî navdare li Kurdistana Başûr. Li gundekî devera Dihokê, li sala 1948-an ji dayik bûye. Li zanistgeha Bexda beşa cografi xwendîye. Dîwaneka helbestan bi navê "Ji evîna çirayên kevin" çapkiriye û gelek

Kekê mino,
çerxa va rojan û şevan...
çenda xware
ne şîlqek bi vê gomê dikevît
ne pêlêd rûbarê zûha,
tête xware.
Eve serê hinde salane, dibizivim
xo dihavême gera mirnê
di nav agirî da dinivim
da lîsekî bo zarokêd xo binijim,
çi ne diyare.

Kekê mino,
xemêd min naçine, çi deftera
kulî beşkî
xerzê xo rête zeviya
sîbera xo,
kêşa hindavî geliya û...
çi teşqîlî di va devera?!
de rabe kekê min rabe
hespê xo têzke
rima xo germ ke
çavekî li dewr û piştêd gundê
me bigêre
vî derdî ji canê wî bişo...
vavêre kesera.

Kekê mino,
çi dareka rehdirêjim
di vî warî da
ba û bahozêd paîzê
belk werandin
ta qirandin
çi bêbextin di vî karî da
belê keko
hemî bihareka taze
êşa dikujim
şaka dihavêm
kesk dikem xemlê
wekî xorte zavayekî di ji'yê...
çwarde salî da.

Kekê mino,
ava vî rûbarî çîma,
şel û bêle?!

nivîsar û vekoîn li ser edebiyata kurdî, bi taybetî
li ser helbesta klasîka kurdî, bi zimanê kurdî û erebî
li rojname û kovarên Êraqê û Kurdistanê belav kiri-
ne. Niha mamostaye li bajarê Dihokê.

LAWIK

bo hindeka...
qend û hingvînê mêsaye û...
bo me jara hemîse ya,
xwa û xêle.
Ezê rabim berê vî rûbarî rast kem
serevraz kem
da bigehîte,
com û omêdêd têniya û...
gişt nihêle.

Kekê mino,
eve hateve û xerzê
"felereşka"(1)
xewin sotin
hîvî dotin
mirandin miştaxêd tirî û...
xêrêd meşka.
Dê rabe destêd xo helke û
hêrişeka mîrane kelke û...
bihêle tu teşmokê wan
careka dî,
bikevît teşka.

Kekê mino,
Hayê... hayê
min û te û evê êşê û...
vê belayê
xo berdaye şar û gunda
dar û bera
zevîk û bêderêd kayê.
Dê rabe kekê min rabe
xo bike taveka baranê û
gurmêneka,
heyva gulanê û
bişo kolanê gundê me,
ji evê tayê.

Kekê mino,
ez dizanîm bi kul û janî
ne ev şeva tehl û giran...
rehêd xo ji nav me dikêşit,
diçit bi ciwanî
ne ji evan tarî ewirka...
têt baranek,
bizêt kanî

ka baxive...
çi tov teyrî û çi siwarî
di ser sinorê sê dewleta ra difirî
xirdikey damî!?

Kekê mino,
Siyabendê Sîlivî me
şeva dibirim
li ser banêd ewra difirim
perdaxeta azadiyê min divêtin,
pêdivî me
hindî reşçavêd xecokê biteysin û...
bilqa biden
wekî stêrokêd esmana...
şilka biden
li ser evîna xo yê riştim
lêvenabim,
bi hîvî me.

Kekê mino,
di nav çepera da em yê dibûyn
emê çavêd ronahiyê û...
şenge sîlavêd rastiyê
bi cana dikirîn
roj bo rojê bilind dibîn
berif stêra
berif erşê gord û mîra
bo sebanê rojê,
difirîn.

Kekê mino,
Evî kewî çi qebqebe?!

hindî tomkê jehirkirî û...
pirteqalêd dermankirî
li ber rêzdiken,
pê nakeve
nêçirvan...
Hey tajîyê ravêd xelkî û...
"serşorvan"
di nav rikê da
di nav berfê da
di nav agirê dozexê da
ez namirim
li hîviya mirna min,
qet nebe!

BERBANGA ZAROKAN

GELÎ ZAROKÊN DELAL!

Di hejmara "Berbang" ê ya berî vêna, me ji wera çiroka "Bilûra Sihri" ya nivîskarê Sovyetî, Sergey Korîpanov wergerandibû zimanê kurdî û belavkiri-bû. Em bi xwe nizanin we çirok xwand, an na. Lê belê heviya me eve, ku we çirok xwendîye. Ji me re binivisînin, ka bi dilê we bûye an na? Gelo hûn bi xwe karin çirokên weha binivisînin? Em bendî

nivisandinên wene.

Di vê hejmarê de me çirokek din jî ji yên Sergey Korîpanov wergerand zimanê kurdî. Em hevîdarin ku kêfa we wê jê re bê. De heyâ hejmarek din, wê çavêne me li riya çirok, hel-best û wênên we bin.

LAWIK Û STEYRIK



Hebû tunebû, hebû lawikek. Xwezî û daxwazên wî pir bûn. Geh wî dixwest zû-zû mezin bibe, geh jî dixwest ji hemû kesî xurtir be û geh xweziya xwe bi gera li cihanê tanî...

Dayika wî bi rûkenî jêre digot:
—Xwaziyên te ewqas pirin, ku ne her sahirek kare wan ji te re bi cî bîne.

Lawik li diya xwe vegerand:
—Hema xwaziyek ji wan ji min re çê bîba!

Dê jî digot:
—Wê xwaziya te here serî, heger steyrikek ji asîmanan bikeve. Lê ji bo vî tiştî, divê tu pir sebir bikî, çimkî steyrik kêm ji asîmanan dikevin.


-Ev ji hemû tiştî rihetire, lawik bi kêf got. Ji ber ku ji diya xwe pir hez dikir, jê pîrsî:

-Ma ez ji steyrikê, ji bo te çi bixwazim?

-Delalet min, bi dilpakî mezin bîbe. Eve xweziya ku ji xwe re dixwazim, Dê got.

Êvar hat. Asîman mişt steyrik bû. Lê yek ji wan nehate xwarê. Êvarek din hat û yek din jî... Her steyrik neketin. Lawik her sebir kişand, tim û tim berî xewê li asîmanana dinêrî û bendî steyrika ku wê xweziya wî bi cî baniya, dima.

Dawiya dawî, rojekê ji rojan, ji



asîmanana steyrikek rijiya û mîna tîrêjê xwe berda jêr. Ew li ber

Nivîskar: Sergey Korîpanov
Wergêr: Bavê Nazê

nigên lêwik kete erdê û hawîrdo-ra wî kir rohnî.

Lawik jê pîrsî:
—Xwene bi rast tu karî xweziya min bibî serî?

Bi xemgînî steyrikê bersîv da:
—Erê ez karim. Heger ez xweziya te bibim serî, ezê di ciyê cî de vemrim.

Dilê lêwik bi steyrika xwaşik şewitî û jê pîrsî:

—Venemre û vegere ba xwûşkên xwe.

Stêrik bi asîmana ket û ban wî kir:

—Min bi serê xwe ji te qebûle, lawikê dilpak!

Lawik jî ma ecêmayî û ji xwe re got: "Steyrikê ji min re got, ku ez dilpakim, bê ku ez pirsa xwaziya xwe jê bikim."

Steyrikên dûr kirin çîng-çîng û gotin:

—Çi lawikekî ne wek her lawikaye. Bi xwe ew nizane, ku dilpakî, yanî xêrkirin û qencîkirin bi xelkê reye.

Hînga lawik got: "Çiqasî baş bû ku min steyrika çîrisandî berda. Heger her steyrikekê xweziyek bibra serî, wê asîman bê steyrik bimaya. Ewê bîba reş û tarî. Dêmek wiqas steyrik diçîrisînin, mana xwe wiqase jî xêrxwaz li din-yê hene."

ŞANÊN NÛ WEŞANÊN NÛ WEŞANÊN NÛ WESAN

Sê pirtûkên nû:

Daxwazname,
Şêx Sen'an,
Di Rêya Cigerxwîn Da.

Di van rojêne dawî de Weşanxana Roja Nû, sê pirtûkên helbesta weşand. Ji pirtûkan yek, Dîwana Namî, Daxwazname ye. Ew dîwan 54 rûpele û têde 20 helbest hene.

Pirtûka Şêx Sen'an (Şêxê Senhanî), berhevokek ji helbesten Feqiyê Teyran e. Çapa orjînal ji alî Dr. M. B. Rudenko ve bi tîpêne erebî hatiye weşandin. Memo Yetkîn jî ji tîpêne erebî werguhêrandiye tîpêne latînî. Tarixa çapa pêşin Moskova 1965 e û çapa duduva jî Stokholm 1986 e. Pirtûk 142 rûpele.

Pirtûka Di Reya Cigerxwîn Da, ew jî helbeste û nivîskarê pirtûkê Gundî ye. Ev pirtûk jî li Stokholmê di sala 1986-an de hatiye çapkîrin. Bi weşandina van her sê pirtûkan, Weşanxana Roja Nû karekî hêja bi cî anîye. Em di xebata wan de pêşketin û serfirazî dixwazin.



Tevgerên Kurdi Ên Netewî û Tekîliyên Kurd û Ermeniyan (sedsala 15-an heta îro)

Li Stokholmê, di meha sibatê de pirtûkek bi navê Tevgerên Kurdi Ên Netewî û Tekîliyên Kurd û Ermeniyan (Ji Sedsala 15-an heta îro) ji alî Weşanxana Orfeus ve hat weşandin. Pirtûk ji zimanê Ermenî tercumeyî Tirkî bûye. Nivîskarê pitûkê Garo Sasonî ye û yên tercumeyî Tirkî kiri-ne jî Bedros Zartaryan Memo Yetkîn e. Pirtûk bi çapek gelek baş ciltkirî hatiye çapkîrin û 247 rûpele. Em ji bo vê xebata hêja ji Weşanxana Orfeus re pêşketin û serfirazî dixwazin.

Armanc bi tonek din derket

Piştî rawestinek dirêj "Armanc" bi tunû rojnamê derket. Ew ji heyşt rûpelan (A3) pêkhatiye. Bi naveroka xwe "Armanc" mîna her rojnameyêñ cedî rengo-rengo ye û bi forma xwe ji spehiye. Li gora ku di gotara rojenî de hatiye gotin, wê "Armanc" ji mehê carekê derkeve. Tişte herî hêja ewe, ku rojnama "Armanc" wê xuru bi zimanê Kurdî bê weşandin. Em bi xwe serkewtinê û berdewambûnê jêre dixwazin.



DET KURDISKA SPRÅKET OCH DESS DIALEKTERS GEO- GRAFISKA SPRID- NING

(Zimanê Kurdi û Belavbûna
Cografya Dialetkêni Wî)

Bi vî nav û nîsanî berhevokek bi zimanê swêdî derket. Ev berhevoke, vekolîneke li ser zimanê kurdi û dilaektêni wî. Bi zimanî îngîlîzî li Bexda sala 1983-yan, ji alîye nivîskarê kurd Fiwad Heme Xurşîd i hatiye nivîsandin û Birgitta Mellander wergerandiye zimanê swêdî û sala 1985-a li Stokholmê hatiye çapkîrin, bi pêşneyarî û alîkariya Ferhad Shakely. Berhevok ji pêşgotinekê û çar besan pêk têt û bi çend serinceka (not) bi dawî têt. Beşa yekan bi navê zimanê kurdi, ya dudyân dialektêni zimanê kurdi, beşa sisyan nexşeya dialektêni kurdi û ya çaran encama vekolîne (lêgerîn). Her wisa du wêneyêñ roh-nîkirinê têdane. Yek li ser zimanêñ Hindî-Ewropî û ya din nexşeyeke li ser belavbûna cografya dialektêni kurdi. Ev berhevok bi qewarê mezin e û 27 rûpele.

"ÇARÇIRA"

Hejmara 1-an ji kovara "Çarçira" derket. Kovara "Çarçira", kovareke çandeyî -giştiye, ji alîye Projeya Kurdi li Stockholmê tê weşandin. "Çarçira" bi alfabeaya erebî û latînî û bi diyalektêni kurmanciya jorîn û jêrî derdikeve. Di beşa kurmanciya jêrî de mirov rastî van nivîsaran dibe: Witey Jimare-ji alîye redaksiyonê, Hecî Qadir Koyî, helbestevanekî kurd e, di navbera salên 1817-1897 jiya. Şoreşa Mîr Bedirxanê Botanî-ji alîye Dr. Kemal Elî. Ehmed Muxtar Caf û Çîrokî Meseley Wijdan-ji alîye Dr. Cemşid Heyderî. Awaz û Goranî Millî Kurdi-ji alîye Bîrûsk. Kurdnasiy Rûsyâ Lê Sedey Nozde da. Di beşa kurmanci de, Edebiyat û Rewşa Me Ya Îroyîn-ji alîye Rojen Barnas. Hunermendê Kurd M. Elî. Gergerînok an Siwarê Bi Tenê-ji alîye Bavê Nazê. Helbesteka Tosinê Reşîd. Nîrx-pêdanek Li Ser Kar û Xebatê Celâdet Bedirxan, Mihemed Elî Ewnî û Elî Seydo Goranî (miqala Dr. Kemal Ahmed Mezher, werger: M. Dersimî) Helbesteka helbestevanî mezîn Hêmin. Kovar ji qewarê(hecim) navîne û 50 rûpele. Em ji kovara "Çarçira" re serkeftin û berdewambûnê dixwazin.

Çarçira
Rissingepl. 3, bv.
163 62 Spanga



"Kurdistan Press" di 1-ê Îlonêde dest bi jiyanê dike

"Di 1-ê Îlona 1986-an de Kurdistan Press dê mîna rojnameyek 15 rojîn dest bi weşana xwe bike. Rojname dê bi kurdi û tirkî derkeve..."

Vê agahdariyê, xebatkarê "Kurdistan Press" di belavoka xwe agahdaride didin. Em ji nihade xêrhatina "Kurdistan Press" dîkin, jiyanekê dirêj û serketinê jêre dixwazin.

Geli xwendevanên "Berbang" ê,

Rola kovarekê di civatekêde çiqas giringe, em bawerîn hûnê taqdîr bikin. Disa em bawer dikin ku hûn dizanîn weki kovarek bi cî zehmetiyê û mesrefî derdikeve.

Bi taybeñ di civaka me kurdande roba kovaran pîr giringe û her weha pêwistbuna wan di ware pêşda birina çand, ziman û edebiyata me, hisyarkirina gelê mede pîr mezine. Armanç ji wesandina "Berbang" ê ji eve; tevibûna karê pêşdebirina ziman, çand û edebiyata kurdî, hisyarkirina gelê meyê bindest. Li bo ku ev karê pêwist bi serfirazî bincesc, bê guman silfariya xwendevanên "Berbang" ê lazine. Alikariya ku em ji we hêvi dikin eve; hazirkirina nivisaran, hazirkirina xeberen di mintiqen wede û besik abonebûn û peydakîrîna aboneyen nû.

Herweha aifikariya abori ku hûn ji bo "Berbang" ê rîbikin, cîhekî girîng distîne. Em ji aboneyen "Berbang" ê yên kevnare hêvi dikin ku heqê xweyi abonetiyê (100 Skr.) bisîmin û ji xwendevanên nû ji hêvi dikin ku bibin aboneyê berbangê û heqê xweyê abonetiyê rîbikin.

Serfiraziya "Berbang" ê, serfiraziya xwendevanên wêne.

Di gel silavên birayeti serketina we dixwazin.

Redaksiyon

AGAHDARÎ

Federasyona me wê di roja 9-ê Tebaxê festîvaleke çanda kurdî li bajarê Stokholmê (li derva) amede bike. Di festîvalêde emê çanda kurdî: bi stran û dîlan, raxistin û xwarina kurdiye pêşkêş bikin. Hûn tevî zar û zêçen xwe, cîranên xwe bi xêr bêñ festîvala çanda kurdî.

Cîh û dema festîvalê:

9.8.1986 seet: 12.00 — 20.00

Vasa Parken (T-bana Odenplan)

Eger baran bibare, emê li Folkets Hus li Rinkeby (T-bana Rinkeby) festîvala xwe bidomînin.

Komîta Festîvalê

BIBE MAMOSTEYÊ

ZIMANÊ KURDÎ

Kêfa te ji zarok û ciwananre tê?

Gelo, tu dikarî du salan di zanîngehêde bixwinî?

Wê çaxê fermo muracata xwe ji bo xwendina payizê ku di 25.8.1986-ande destpêdike, bike. Divê muracata te bi derengî di 11.8.1986-ande di destê mede be.

(Eger mafê te yê xwendinê di zanîngehêde hebe, di 18.8.1986-an de tu wê têkevî imtîhana ziman.)

Ji bo agahdarî û wergirtina fişê muracatê, telefonê Hemspråkslärarlinjen bike.

Telefon: 08/221680

Zanîngeha Xwendina Mamosteyetî Li Stockholmê

Navnîşan:

Högskolan för Lärarutbildning i Stockholm
Box 34103
100 26 STOCKHOLM



کچه شپر ئرووھە کە

وەرگىترانى لە سويدىيەوە
بە دەسکارىيەوە / خەجە

كات ... رۇزىيىكى گرمى هاوين بسوو، خۆر ئەدرە وشا يەوە و تىيشكى زىيرىنى بەسر كەز و كىتىو دەورۇپشتى ئاوايىي يەكەدا پەخش كردىبوو. كچە لادىيى يەكى نەشمەيلانەش سەتلەتك شىرى خستبۇھ سەر سەرى و بەرە و شار كەوتبۇھ رى، بۇ ئەوهى شىرىھ كەي بىغروشىت. كچەي نەشمەيلانە وورد وورد پىتى ئەبرى و كەوتبۇھ خەياللى خۆشى خۆيەوە :

- بە پارەي شىرىھ كە چەند مەريشىكى ئەكرەم، هەموو رۇزى ھىلەكەن، ھىلەكە كانىيان ئەفرۇشم بە پارەكەي كراسىتىكى سورەمى سەوزى جوان ئەكپەم لەگەل ملۋانكە يەكى مروارى دا، دوايىي ئەچم بۇ بازار ھەرچى كورپى گەنج ھەيە داخوازى ئەكەن سەمايان لەگەل بىكم ، بەلام من پازى نابم

كچەي شىر فرۇش بەدهم ئەم خەيالانەوە پېتىگاي ئەبرى ...
لە پېر قاچى لە بەردەتك ھەل نۇوتا و سەتلە شىرى لە دەست كەوتە خوارەوە و شىرىھ كە رىزا ، تەنها سەتلە بەتالىكەي بۇ مايەوە
ئىنجا ووتى :

(بۇيە باشە تا نەگەيتە سەر لوتكەي گرددەكە ، هاوار نەكەي)

TAWANEKA DIN A SEFARETA SEDDAMÎ!

Li bajarê Eskilstuna sefareta Seddamî destdirêjiyeke din kir bi kuştina lawê kurd Brehîmî û keça kurd Befrînê.

Brehîm û Befrîn li bajarê Eskilstûn diman û tenê ew şes meh bûn bi ser daweta wan de borîn. Li 30.5.1986 termên bûk û zava li daristanekê hatîne dîtin. Li gor raporê polisê Eskilstûna Brehîm û Befrîn keti bûn ber eşkenceka gele dijwar û derb û şewitandin li laşê wan eşkera xuya dikirin. Ev tawana bêbeht dengekê bilind

li nava Kurdan û Swêdiyan de. Federasyona me ev tawane protesto kir û nameyek ji Wezareta Edliya Swêdê re şand û bi dû nûneran û bi ala Kurdîstanê tevi merasimên cenazên wan bûn û meşeka mezîn li bajarê Eskilstuna pêkhat, ji centerê Eskilstûna destpê kir û deh kîlometra domkir û bi qasî 100 kesî besdarê meşê bûn. Em serxweşiya dayik û bay û kes û karêن Brehîm û Befrînê dikin û rijêma faşista Seddamî û sefaretêن wê rûreş dikin.

**Navnîşana Federasyonê
ya Seredanê:**

Hornsg. 80, qat 1.
Stockholm

Nivîsandînê:
BOX 45205
104 30 Stockholm
Telefon: 08/68 60 60
Lokala Federasyonê herroj navbera seet 10.00 û 18.00 vekiriye.

ئاسك

نوسيينى : تولستوى

جارىكىيان ئاسكىك ئەچىتىه سەر رۇوبارىك ئاۋ بىخواتىوه ، خۆى لە ئاوه كەدا ئەبىنى ، شادمان ئەبى كە ئەبىنى شاخەكانى وا جوانى ، پاشان سەيرى قاچەكانى ئەكا و ئەللىي : تەنبا قاچەكانم بارىك و ناشىرىينى .

لەپەر شىتىرىك پەيدا ئەبى و قەلەمبازى ئەدا بۇ ئاسكەكە. ئاسك خۆى دەرباز ئەكاو بە بازدانى خىرداو گۈرە لە دەست شىتىرىكە پىزگارى ئەبى. كە ئەگاتىوه ناو دارستانەكە ئەزانى بە ھەلە دا چووبىوو ، لە دلى خۆيدا ئەللىي من چەند گىلىم ! وام ئەزانى قاچەكانم بارىك و بىي كەلكن ! كەچى هەر ئەوان پىزگاريان كىرم . دلىم بە جوانى شاخەكانم خۆش بىوو ، كەچى ئەوه ندەي نەمابىوو بە خۆى ئەوانەوه سەرم تىيا چى !

دۇو ھاوارق

نووسىينى : تولستوى

جارىكىيان دۇو ھاوارىي بە دارستانىكىدا ئەرقۇن ، لە ناكاوا وورچىك دەردەكەويى ، يەكىنلىكىان رائەكاو سەرئەكەويىتىه سەر دارىك ، ئەسىرى تىريان بە تەنبا ئەمېنېتىوه ، بەلام باش ئەبى بىرى ئەكەويىتىوه كە وورج توخنى لاشى مىددە ناكەويىت. يەكسەر خۆى ئەدا بە زەويىدا و خۆى دەكا بە مىددە ... كە وورچەكە ئەچى بەلا يەوه ، هەناسە لە خۆى ئەبرى . وورچەكە بۇنىتىكى دەم و چاوى ئەكاو ئەروا .

كە دوور ئەكەويىتىوه ھاوارىكەي لە دارەكە دىتىه خوارەوه و لىيى ئەپرسى : ئەوه مام وورج چى بە گۈيىدا چىپانى ؟

وە لەسى ئەداتىوه و ئەللىي : ووتى « مەۋى خراپ ئەو كەسەيە لە كاتى تەنگانەدا لە يارمه تىدانى ھاپرىكىانى رائەكەت » .

بیرو بازاری سر لی شیواوی ۱۹۷۶ میوانی نازداری که گاکان بوو
که خۆیان سواری میشک و میژوی مەچەک ئەستوره کان کردبوو .
ساوه ریئکی چەورو پې دوشاد ، ترشیات و دۆلکەیەکی پې ماستاو ،
کەوه رو نانی تیری له سر خوان بوون ، کاتی چاوی سەوزى ھەلبپى
بە دەنگىئکى ئاللۇزەوه ووتى :

— من دەپۇم و خەمی تۆ و خۆشەویستى و رق لەكۈل دەگرم .
+ ھەی ئازىزم ، تۆ دەرپۇی و خەمی من و ھەزاران زىاد دەکەی ،
تۆ دەرپۇی و وورگى دەيان زلتى دەکەی !
کارگەکەمان بیرى لە ھەموو پیتویستى يەكانتان كردۇتهوه ، ھەر بۆيە
بەم بەرھەمەی دەيەۋى ئەرك له سر شانتان كەمکاتھوه و لە
جوانىستان زىاد كات !

« بەھىوا بۇويت دەستى بگەيت و له سر مەكىنه كە بىھىننەتە
خوارى ، ئاواتت بوو كۆتايسى بە دەنگى پې ئازارى مەكىنه كە بىتتىت
و ئىتر بىستىنى ئەندازىرە تەنها بۆ پیتویستى يەكاني خۆمان بىت
، بەلام دەستى خەزان گولى تەمنى ھەلسوھ راندى ، ئاواتى بىست
بەھارى خنکاندى » .

کابراى قات لەبر دەنگى ناسك كردهوه ، درىئەھى بە زەرده خەنە كەى
سەر لىيۇدا ، ويستى سەرنجم رابكىشى ، نەي ئەزانى لە مەنگىي
دەردم بىتى ، يا لەگەرده لولى بىرى گەراندا بەدواى سەرى كلاۋە
ئاللۇزدا لەكارم خات ، بەزمانى تايىبەتى چىنە كەيان ووتى :

— ئىستا بەریزتان ئەلین چى ؟ مەكىنه كەمان ناكىن ؟

+ دەنگى مەكىنه كانتان بەرزن بەرادەي مەكىنه يەكى كۆنى سنجەر ؟

— نەخىئىر ! بىتەنگن و زۇر بە نەرمى كار دەكەن

+ بى دەنگى و خوشەویستىي سەرزارييان ھەلگرى تىشىو
رۇقىتىكى خەستەو ھەموو بەيانىك بە زەنگى كات ڈەميرىك لە مىشكمانى
ئەئاخنن ، منىش وىللىم بە دواى ئاوازى مەكىنه كۆنەكەدا ، ھەر بۆيە
مەكىنه بى دەنگە كە تان ناكىم .

توانامی ده ههژاند ، رپ و خوشویستی تیا دروست کردم .
ده رزی مهکینه کهت له پنهنجه خویناوی یه کهت ده رده هینا و به په نگینکی
زه ردو زمانیکی پر ئازار ده توت :
— بنوو روّله ختای خوم بwoo ”

ئم جوره يان به کۆمپیوتەر ئىش دەکات ، ده توانى شەش
پرۆگرامى بده يتى و به دوانزه شىوه نەخش و نىگار درومان بکەيت
” دوو روّزى تر جەڻنە ، دە بى جلى خلک ته واو بکەم ،
دە بى نەنۇوم .

— دايە تۆ هەر خەياتى دەكەيت و هەر هيچمان نىه ؟
+ هەمانه ، ده توانين كرىخانوو بده يىن ، ده توانين تىئر بە سكى
خۆمان بخۆين ، شەويىك نەبوه بە برسىتى بنويت .
— ئەي بو ئىوارە دەرپىو كراسە تازاكەت فروشت ؟
+ بنوو روّله .

ئىمە ده توانين خۆمان مەكىنه كەتان بۇ بەھىننەن مالەوە ، كارگە كەمان
ھەموو پارەي گواستنەوە لە ئەستۆ دەگرى ، تەنها مەبەستمان
خزمە تىكىدىنى كېيارە خوشویستە كانمانە .

” دە مارەكانى دەستى تەنگىيان بە پىستەكانى سەريان ھەلچنېبۇو
ھەرييەكى لە چرچەكانى لاچاوى چەند پايزىتىكى روّنگ زەردى
ده خستە سەرتەمنى ، بە دياردە بەرە و گەلارپىزانى ئەم پايز نا
، ئۆمى تر دەچوو ، قاچە قلىشادەكانى نەخشەي ھەموو كۈلانە خواروو
خىچ و قوراوىيەكانى دەرگەزىنى تیا كېشراپوو ، مەلېنەندى ۋىيانى
كەنگەرانى سەرشهقامى تیا نەخشىنراپوو . ”

دانان و بەكارھىنانى يەكمە جاري مەكىنه كانمان بە ووردى و ساكارى
لە دەفتەرەتكدا نۇوسراوە ، بىنگومانم لە وەي ھىچ گېروگرفتىك نايەتە بە
رەمتان لە تىگە يېشتىيا !

” شەو زستان بwoo ، ھىز فرۆشەكان سەرمایان بwoo ، تەنگىيى

مهکینه‌ی دروومان

رۆزا

ستوکهولم ۱۹۸۶/۶/۷

له‌گل کردنوه‌ی ده‌رگاکه‌دا، قات له‌بیریک بـه‌خـوی و شوناس‌نامه و زه‌ردەخـه‌نه دروست کراوه‌کـهـی سـهـر لـیـوـیـهـوـهـ، نـهـخـشـهـی دـیـمـهـنـهـ ئـاشـنـاـکـهـ یـانـ بـوـ جـارـیـکـیـ تـرـیـشـ کـیـشـایـهـوـهـ :

ـ رـوـژـ باـشـ، من فـرـوـشـیـارـیـ کـارـگـهـیـ «ـسـهـرـبـهـسـتـیـ»ـ مـ، ئـیـمـهـ لـهـ درـوـسـتـکـرـدـنـیـ مـهـکـینـهـیـ دـرـوـوـمـانـ دـاـ تـازـهـ تـرـیـنـ تـهـکـنـیـکـ بـهـ کـارـ دـهـ هـیـنـنـیـنـ، هـهـنـدـیـ لـهـ مـهـکـینـهـ کـانـمـانـ بـهـ کـوـمـپـیـوـتـرـ کـارـدـهـ کـهـنـ، هـیـزـیـ مـوـتـورـ کـانـیـانـ لـهـ

تهـنـیـاـ لـهـ جـوـوـلـهـیـ دـوـوـ لـیـوـ زـیـاـتـرـ هـیـچـیـ تـرـمـ نـهـبـیـنـیـ لـهـ باـسـیـ مـهـکـینـهـ کـانـیـداـ مـیـشـکـیـ پـیـرـ قـیـنـ وـ ئـازـارـمـ رـوـچـوـوـهـ رـاـبـورـدـمـهـوـهـ، کـاتـ چـرـکـهـ چـرـکـهـ کـهـوـتـ گـهـشـتـ بـهـ نـاوـ مـیـژـوـوـماـ :

ـ هـمـوـوـ ئـاوـاتـتـ گـهـوـرـهـ کـرـدـنـ وـ دـابـیـنـ کـرـدـنـیـ ژـیـانـیـ سـیـ کـوـرـپـهـکـهـتـ بـوـوـ..... هـمـوـوـ ژـیـانـتـ کـارـکـرـدـنـ وـ کـوـلـهـمـهـرـگـیـ بـوـوـ بـوـ ژـیـانـیـکـیـ باـشـتـرـ بـوـ دـرـئـهـ کـانـتـ

ـ هـیـ هـهـژـ بـهـ سـهـرـتـ ، دـابـیـنـ کـرـدـنـیـ ژـیـانـیـکـیـ ئـاسـودـهـ بـهـ هـیـمـنـیـ یـهـ نـابـیـتـ »ـ .

ـ ئـهـگـهـرـ بـوـمـ هـهـبـیـتـ بـیـمـهـ ژـوـرـیـ ئـهـواـ دـهـ تـوـانـ نـمـونـهـیـ هـهـمـوـوـ جـوـرـهـ کـانـتـ نـیـشـانـ بـدـهـمـ بـوـ.....

ـ هـمـوـوـ شـهـوـیـ لـهـگـلـ دـهـنـگـیـ ذـهـنـگـیـ مـهـکـینـهـکـهـداـ، وـهـنـوزـ پـیـلـوـهـ کـانـیـ قـورـسـ دـهـکـرـدـ، رـهـقـ تـرـیـنـ وـ بـهـجـوـشـ تـرـیـنـ ئـاوـازـ بـهـ نـاسـکـیـ لـهـ ماـوـهـیـ بـیـسـتـ وـ دـوـوـ بـهـهـارـیـ ژـیـانـمـداـ شـهـوـانـهـ کـفـتـ کـهـرـیـ لـهـشـ وـ لـیـتـکـدـانـیـ پـیـلـوـهـ کـانـمـ بـوـونـ ، جـارـهـ جـارـهـشـ زـرـیـکـهـ یـهـکـ دـرـپـیـ بـهـ بـیـنـدـهـنـگـیـ شـهـوـ ئـهـداـ ، بـوـ تـاوـیـکـ نـوـوـکـیـ دـهـرـزـیـ مـهـکـینـهـکـهـ دـهـ بـوـ بـهـ مـیـوانـیـ یـهـکـیـ لـهـ پـهـنـجـهـ کـانـتـ !ـ لـهـ گـوـمـیـ فـرـوـشـتـنـیـ هـیـزـتـاـ ، خـوـیـنـ وـ وـهـنـوزـ وـ ئـازـارـ ، تـابـلـوـیـ ژـیـانـمـیـ دـهـنـخـشـانـدـ ، بـیـرـمـیـ دـهـرـخـشـانـدـ ،

UTGIVAR KORSBAND

BERBANG
BOX 45205, 104 30 Stockholm

